




Danerê Rojnameya pêşî ya
Kurdî Miqdad Mithed Bedirxan

Zaxo di bin postalên leşkerên Tirkan de

□ Herçiqas berdevkîn hukûmet û dewleta Tirkîyê dibêjin ev operasyona me ya leşkerî tene li dijî PKK'ê ye, lê hecim û mezinahiya operasyonê nîşan dide ku ev rasterast dagirkirina wellatekî ye. Şerê xwekujiyê ku di navbera PDK û YNK'ê de heye rê dide ku Tirk bi hêsanî welatê wan dagîrkin.

Di berbanga sibeha 20'ê Adarê de dewleta Tirkîyê bi hêzeke mezin ji çar ciyan leşkerên xwe xistin Kurdistan'a azad. Dewleta kolonyalist a Tirkîyê bi F-16, F-104 balafrîn fantom û helikopterên kobra kampê PKK'ê yên Bote û Şivîyê bombebaran kirin û zêdeyî 35 hezar leşker, tîmîn taybetî û bi techîzatê mezin yên leşkerî bi tanq û top û roketan, bi rehberiya "Koruciyê Gundan" ji Xabûrê, ji Beytûşbabê, ji Şemdinliyê



35 hezar leşkerên dagirkir di deriyê Brahîm Xelîl de dikevin axa rizgarkirî

û ji Çukurcayê bi kûrayiya 45 km ketin axa azadkirî. Di vê operasyonê de 33 generâlîn girecir ji leşkeran re komûtanî dikin û ev operasyon di nava 368 km çargoşe de de diqewime. Li gor hin çavkaniyan pisporên Israîlê ji di vê operasyonê de li ba Tirkîyê cî digrin. Nûçeyen ku ji

herêmê têbajarê Zaxoyê bi temamî ji aliyê leşkerên Tirkîyê ve hatiye dagirkirin û gellek kes hatine girtin û tadayîk mezin li xelkê tête kirin. Xelkê Zaxoyê di bin endîseyeke mezin de dijîn.

Dûmahîk: r. 11

Serê navxwe Birîn kûr e derman dûr e

□ YNK'ê, PDK bi peqandina pirekê tawanbar dikir û PDK ji YNK'ê bi teqandina tîrimbêla ku li Zaxoyê hate teqandin û di encam de 76 kes mirin û pirtir ji 150 kesî ji birîndar bûn, tawanbar dike. Heger ev iiddia rast bin diyar dibe ku herdu ali li hemberî hev hin metodên şerî yên nû bi kar tînin, ku di jîna têkoşîna xwe ya çekdarî de tu cara li dijî dijmin bi kar neanîne



Şerê Kurdkujiyê yên ku li başûrê Kurdistanê rû daye, herçiqas wek şerê cepheyî rawestiyabe ji rewşa ser her berdewam e û tu nîşanên ku dê ev ser di demekî kurt de bi dawî bê nayênxuya kirin. Erê şerekî berfireh nuha nîne lê belê gelek caran li hin deveran ser ges dibe û rewşa ewleyî ya gelê me yê vî perçeyê welatê me roj bi roj xirabtir dibe.

Herçî herdu aliyan şerî, PDK û YNK'ê dest bi vekirina rûpelên

defterên kevn kirine û şerê ragehandîn yê li dijî hev her ku diçe tûjtir dibe û rewşa hîn xirabtir dike û nuha vî şerî xwe gihandiye medaya Awrûpayê ji.

Her çend di daxuyanî, belavok û hevpeyînê herdu aliyan de ji tê gotin ku ev şer şerî nemana kurdan e û divê nebe, lê di prakîkê de şer her berdewam e.

Ne penagirtina 59 parlamentaran di avahiya parlamentoyê de,

Dûmahîk: r.11

Li Diyarbekirê Navenda Kulturî vebû

□ Di van şertîn dijwar de elaqeyeke mezin ji bo MED-KOM'ê (Navenda Medya ya birêxistina sen'et û kulturê) hat nîşandan. Zêdeyî 700 kes di vekirina wê de beşdar bûn.

□ Berpirsê MEDKOM'ê Îrfan Çilgin: "Em li benda piştgirî û alîkariya hemû dezgeh û muese-sênen netewî ne"

kirin.

Di vekirina MEDKOM'ê de 700 vewwende beşdar bûn. Di nav beşdaran de Serokê Baroya Diyarbekirê Av. Huseyîn Tayfun, Sekreterê Baroyê Av. Sezgîn Tanrikulu, Berpirsyarê buroya Partî Demokratî Kurdistan-Yekînî li Diyarbekirê, Ahmet Zêbarî, serokê HADEP'ê liqê Diyarbekirê Fırat Anil, serokê Herêma 8'an yê DîSK-Genel-İş'ê (sendika karkîren belediyê) Haci Yîğit, serokê berê yê Rêxistina Tabîban Mahmut Ortakaya, nûnerê TMMOB'ê (rêxistina muhendis û mîmaran) yê liqê Diyarbekirê, serokê DîSK-Genel-İş yê li Diyarbekirê, nûnerê Egîfîmsen (sendika mamooste û perwerdekaran) yê li Diyarbekirê, endamên Komîta Karkir ya HKD û berpirsiyârê rojnama Dengê Azadî li Diyarbekirê jî hebûn. Ji nav welêt û ji derveyî welêt gelek mesajên pîrozbahiyê gîhistîne rîvebirê MED-KOM'ê.

Piştî axaftinê, hunermendîn ku ji çar aliyên welat hatibûn, bi program û muzîka xwe beşdar şad

Dewletê Dengê Azadî bi temamî Medya Gunesi jî ji bo mehekê girt

□ Êrişa dewletê ya li ser çapemeniya Kurd berdewam e. Piştî Ozgur Ulkeyê dewletê Medya Gunesi ji bo mehekê û Dengê Azadî jî bi temamî girt. Di mehekê de dewletê 4 caran avêt ser buroya Medya Gunesi ya Edenê û 4 caran jî ya Diyarbekirê.

Roja 9'ê Sibatê dewletê du pirtûkên ku ji aliyê şîrketa Çarçira ve hatine çapkirin; "Progra



ma

YEKBUN'ê (Partiya Yekbûyi ya Gel a Kurdistanê)" û "Belgeyîn Kongre Duyemin ya YEKBUN'ê -Raporâ Politik, bîyîrî" 4 seet piştî ji matbaayê derketin, civandin.

Dewleta Tirk di van 3-4 mehîn dawiyê de êrişike tûnd dibe ser çapemeniya Kurd. Dewlet di vê êrişî xwe ya tevâyî de hemû dezgeh xwe kirine bi rî xistine û hemû riyan; legal, illegal muhabib dibe. Ji Si tematizebûn û motifîn êrişan diyar dibe ku, ev

êriş bi bîyareke giştî û bi zincîra "emr û komûta" têb meşandin. Navnîşana bîyîrî ji ne xerîb e: Konseya Ewlekarî ya Tirkîyê.

Êriş bi bombekirina Ozgur Ulkeyê dest pê kir. DGM'ê (Mahkema Ewlekarîya Dewletê) bîyîrî bi dû bîyîrî derêxistin, hemû rojname û weşanên Kurdistanê perwer bi cezayîn hepsî û yê pera bombardûman kirin. Polis

Dûmahîk r.11

Cendekî berê, di kanalê televzyoneka şexsî de, munaşeyek li ser kiryar, berpirsiyar û sedemîn êrîşa li ser xelkê Alewî yê mehella Gazîosman-paşa ya Istenbolê dihat kirin. Ciwanikeke rojnamevan a Tirk, bi cumleyeka gelek kurt halê ruhiyeta wê civînê û ya siyaset, rojname û televîzonên Tirkîyê yê vê dema pişti êrîşê da diyarkirin. Ciwanikê got ku "em dibêjin dinya tê guherîn: piçûk dibe, jiyan û pirs û têkiliyên civakan naverok û awayen global werdigirin, lê di me Tirkan de xwiya ye ku tiştek bûye global, ew jî paranoaya me ye."

Berdevk û berpirsiyarê partiyen Tirk, siyasetmend û wezîren kevin û nuh ên ku di programa munaşê de bûn, bê iştîsna hemûyan: ji berdevkê Dogu Perinçekî bigire heta yê Erbekanî, bi mutefikî, idia dikirin ku pêçika derva di vê êrîşê de heye. Yunanistan hema hema ji bo hemûyan destnîşankiryeke muşterek bû. Lê jê pê ve di destnîşankirina xwediyê pêçikê de carna hin dihatin ba hev, carna jî ji hev dûr diketên. Xwediyê pêçikan ji alî her siyasetmendî li gor mîjî, mantiq û emelê xwe, bi wî awayî dihat diyarkirin ku Amerika, Yunanistan, welatên Awrûpa, Rûsya, İran, Sûriye û welatên Ereb yê din, Ermenistan û Israîl jî bûn hêzên li pişt vê êrîşê.

Gava meriv guhê xwe dida munaşeyen telewizyonê, bîvê nevî meriv digot: way li wan hemwelatiyên Tirk ên sade yê ji dinyayê bêhay! Gava guhê wan li axaftinê van siyasetmend û berpirsiyaran bû, ne mumkun bû ku neketana xofeka welê ku xwedêgiravî hemî dinyayê xwe kiriye yek û berê xwe daye Tirkîyê ku bi carekê de wê perçê bike û daqurtine.

Hukumetê bixwe jî pişti êrîşê ji devê Çiller xanimê dabû diyarkirin ku hêzên derva li pişt vê hêrisê ne û daxwaza wan ew e ku nehîlin Tirkîye guhertinê demokratik di nav xwe de bike, da Tirkîye ji Ewrupayê bê veqe-tandin.

Gelo çima bi hukumet û muxalefeta xwe, dezgeha siyasiya Tirk bi vî awayî "hêzên derve" destnîşan kîribû! Gelo êrîşkar hatibun girtin û itîraf kîribûn ku kew wezîfa kîret daye wan û bi delîlan ev itîrafen wan hatibun îsbatkirin? Yan êrîşkar neyîn girtin jî delî li pey xwe hîstibûn ku diyar dikir ku ajanê kîjan welat an kîjan hêza derve? Na, tu yek jî nebûbû. Ne

Rojeva Mehî

Mûrad Ciwan

"Paranoya yekke globalkiri"

delîl hatibun dîtin ne jî qatîlê êrîşkar ên ser hersê qahwexane û pastexaneyeka mehellê hatibûn girtin an keşifkirin. Qatîlê cînayetîn her du rojîn din diyar bûn; polîsîn resmî yê dewletê bûn ku li ber çavên hemî dinyayê numayışkarêne mehelêyên ku doza hayjêhebûn û adaletê; daxwaza parastina mal û canê xwe ji dewletê dikirin gul-lebaran kîribûn.

Ev ne cara pêşîn bû ku bêyî ku tu delîl û belge di deshî hukume-ta Tirk de hebe, bêyî ku mehkemê dewletê îsbata sûc û sûc-darekî berbiçav kîribûn, dezgeya siyasiya Tirkîyê, sedem an berpirsiyare bû-yereka navxwe, welat an hêzên derva destnîşan dike û wekî gunehkarêne mezîn derdixe ber çavên hemwe-la-tîyên Tirkîyê, wan bi çirokêne bê bingeh û

yê ji derew, buhtan û bêbextîyan avakîr dixapîne. Ev bi rastî jî nexweşîyeka psîkolojik a ci-vakî ya dezgehêne dewleta Tirk e ku di riye "îrsî" re ji Osmanîyan hatîye wergirtin, di de-wra cumhûriyete de wekî çeketî, di hema hema hemî bûyer an pîrîkîn civakî de haftîye bikaranîn û iro jî tê bikaranîn.

Hê 150 sal berî niha tevgera "Osmanîyan Nuh" ya yê wekî Mîhat Paşa û Namîk Kemal û piştre jî tevgera "Jon Tirkan" idia dikirin ku pêçika derva, ya welatên bîyanî di pirsgirêkên miletên Balkan û bindestên İmparatorîya Osmanî de hene. Wan acizîya xwe li dijî Abdulhemidê duduyan nişan didan ne ji bo ku çima mafîn milî yê wan miletên bindest nade, lê çima ku bi siyaseta xwe, rî ve-dike hêz an dewletên bîyanî karibin desten xwe têxin nav siyaset û bûyeren hundire

İmparatoriyê. Tirkan xebata Ereban a pişti Şerî Cihanî yê Yekem jî bi vî awayî izah kirin.

awayî, wekî maşikên welat an hêzên derva dan xweyakirin. İro jî di van numayışen pişti êrîşê de çima ku hin grûbepiçûkên bermayîyan Marksist-Lenînist ên re-qeser hene, hukumet bi bêser-miyeke mezîn dixwaze vê bike delîlek ku destê derva di vî işî de heye.

Gelo, ma nabe ku desten welet an hêzên derva di nav bûyer û pirsgirêkên welatê meriv de hebe? Çawa na, helbet her welat jî di-zane ku gava hebûn an siyaseta wan li menfaatêne hin hêz an welatên bîyanî neyê ew destê xwe dixin nav welatê mirovî, muhawele dikin ku mirovî bikêsin ser xeteka welê ku ligorî menfeetên welatên wan bin. Çawa Tirkîye bi vê meqsedê destê xwe dixe nav welatên din, helbet hin welat jî hene ku destê xwe dixin nav Tirkîye.

Lê ev nayê wê mahnê ku di hemî pirs û pirsgirêkên Tirkîyê yê siyasi, civakî û diplomasî de destê derva heye. Nabe ku hema ci sergêjanî li Tirkîyê peyda bi-bin, berpirsiyaren wê yê siyasi bêyî ku tu tişti bikin, tu tedbiran bigrin an tu meseleyê çareser bikin, hema rabin bîbêjin ku destê

derva di vê meselê de heye.

Wazîfa dewletê ew e ku;
1- Berî her tişti pirs û pirsgir-ekên xwe yê civakî û siyasi bi awayekî heq û adil û li gora ber-jewendiyê hemwelatiyê xwe çareser bike ku hêz an biyaniyê dilnexwaz muhawele jî bikin ni-karibin van pirs û pirsgirêkan iştîsmar bikin,

2- Piştre iştîxbarat û dezge-yen xwe yê dewletê bi vî awayî bixemîlîne ku karibin di wextê de bibînin û bizanibin ka kîjan hêz an welat bi ci awayî, bi rî û saya kî dixwaze destê xwe têxe nav welât û di wextê de tedbiran werbigre, rî li ber vê muhawelê bigire, rî li ber vê tawanê bilind bikin.

3-Her bûyer, êrîş an sûcê ku çêbû ci ji alî hemwelatiyân, ci ji ji alî karmendêne dewletê, esker an polisan be di wextê de, zû bi zû, bi belge, delîl û sûcdaran derxe hemberî mahkeman, wan tesbit bike ceza an tedbîra wê ci ye, bi edalet û heqîyê bide, bi hemwe-latiyân bide bawerkirin ku zû bi zû li vî welatî kes nikare neheqî û tahdeyiye li wan bike û eger hat û hinan zilm an neheqî li wan kir, an êrîş bir ser şexsîyet, hebûn û azadiya wan, hêz û dez-gehen dewletê yê berpirsiyâr, ci polis û iştîxbarat, ci mehkeme û ci ji hukumet û meclis be, heq ci be wê bi cih bikin.

Heke ev bawerî li ba hemwe-latiyân çêbibe, kes nikare wan bixapîne û failê bûyerekê, bi awayekî din nişanî wan bide, wan piş bike û ji bo emelîn xwe berê wan bide ser der û doreke din. Çimkî wê hemwelati iltîfat bi şayîkê nekin û bêjin ku ka rawestin; êrîşkar an sûcîdar kî bin wê polis wan bigre, cezayê wan ci be wê mehkeme bide û zerara hem-welatiyân çibe wê hukumet ji butçeya dewletê telafî bike.

A di dewletêk wiha de, gava dewlet an hukumet tiştekî ji hemwelatiyên xwe re bêje, ew û baweriyê pê bîne. Ne hêz ne jî dewletekâ biyanî nikare di karê xwe yê tevdana hundire welêt de tu iltîfatê bibîne û wê pûc bibe.

Lê gelo Tirkîye wiha ye? Na xîr. Hema bala xwe bidin vê bûyera dûmahîkê. Hukumetê û polîsî wê, ne qatîl girtine, ne sûcîdar tespît kirine, tu belge û kes li ber mehkemê nînin. Lê hukumet jî tê de herkesi xwe bi se-naryoyekê ve girtiye û li gor wê senaryoyê herkesi sûcîdar xwe "dîtiye". De werin îcar binêrin li ecêbiya vî welatî, li vê tirajediya van hemwelatiyân û li vê kome-diya vê dezgeha siyasi.

Tam jî paranoya.
"Paranoya globalkiri".

Kurdistana İranê

Li gor daxuyaniya deftera siyasi ya PDK-î ku di 12-12-2-1995'an de belavkiriye; du Kurdîn ji Kurdistana İranê ku berê endamî wan bûn lê nuha ji sê salan û vir de karê siyasi nakin û li Kurdistana İraqê dijîn, roja 26.1.1995'an de li qezaya Soran ji aliye "Hizbullaha Şorêşger" hatine girtin û teslimî İranê bûne û li girtîxaneya Ürmîyê hatine dîtin. Lê belê nuha aqûbêta wan nayêzanîn. Daxuyanî ji hemû ke-sen welatperwer daxwaz dike ku dengê xwe li dijî vê tawanê bilind bikin.

Navê van kesan ev e:
Mela Ehmed Xîzî, ji gundê Kanîbidax ku li navçeya Nêxedeyê ye, 29 salî, zewicî û bavê zaro-kekî ye.

Mecîd Sildozî ji gundê Siyan ku li navçeya Şinoyê ye, 38 salî û bavê 4 zarokan e.

YNK'ê bi darê zorê radyoya PDK'a İranê girt

Li gor beyana Polit-Buroya Partiya Demokrat a Kurdistana İranê di 18'ê Adarê de YNK'ê li ser daxwaza Komara İslâmî ya İranê bi zorê zorê weşana radyoya "Dengê Kurdistanê" rawestandiye.

Kongreya 4'em a PSK'ê civîva:

"Divê pirsa Kurdî bi aşîti û adîlane bê çareser kirin"

Partiya Sosyalist a Kurdistanê di navbera 11-17'ê Sibatê de Kongreya xwe ya 4'em çêkir. Di da-wiyya kongreyê de ji raya gişî re beyanek hat belavkirin. Li gor beyanê, kongreya PSK'ê dûr dirêj li ser siyaseta Tirkîyê ya ku li hember gelê Kurd dimesîne radiweste û tête gotin ku "bi wêr-an-kirina welêt, bi kuştin û bi xwîn rêtin bi zulm û zorê bi surgûnê mirov nikare bihigêye ciyekê. Divê Tirkîye bibe weliteki hev-dem û bi gelê Kurd re li hev bike û mafê û huviyeta Kurdî nas bike. Riya vê jî avakirina federasyona Kurd û Tirk e".

Kongreya PSK bangî dezgehê, demokratik, humanist û organîzasyonê siyasi dike ku li hember qetîsamên ku dewleta Tirkîyê li Kurdan dike, bêdeng nemîn û gelê Kurd bi tenê ne-helin.

Tirkîye rojnameyên Ewrûpî boykot dike

SWED- Wezareta Tirkîyê ya Karûbarêne Derve ji ber nûcê û komentaren krîtik li ser pirsa Kurdî û politikaya Tirkîyeyê ya li dijî Kurdan nîvîsandiye, boykota reklaman daye ser çend rojnameyên bi nav û deng yê Ewrûpî. Di nav van weşanan de rojnama Swêdî Göteborgs-Posten (ji ali tîrajê ve di nav rojnameyên sibê ya duyem e), rojnama Hollandî de Telegraaf û kovara Almanî Stern û kanaleke TV ya Ewrûpî û RTL e ji heye.

Li ser vê yekê yek ji berpirsiyaren redaksiyona derve ya kova-va Sternê Andreas Hallaschka got: "Ev şerefeke mezîn e ji bo meku em ji alî dewleta Tirkîyê ve têne boykotkirin".

Armanc

Rojnameyâ Kurdî ya mehane/Monthly Kurdish Magazine

Redaksiyon: M. Elî, Hesen Mizgin, Mirza Bextiyar, Lewend Fîrat, S. Rêving, M. Lewendi, N. Elî
Redaktör berpirsiyar: M. Elî, Berpirsiyare beşê Dimîkî: Malmîsanîj,
Berpirsiyare rûpelîn edebî: Ehmed Huseynî

Utges av: Kurdiska Demokratiska Arbetarunionen

Abonetî/Prenumeration: Abonetiya Salekê, Li Skandinaviya: 250 SKR, Maqam/Myndigheter: 450 SKR, Li Ewrûpâ: 60 DM. Li derveyî Ewrûpâ: 50 \$.

Anons/ilan: nîv rûpel/en halvsidan 2500 SKR

Telefon: 46-8-803135 Fax: 46-8-801825 Postgiro: 4972255-6

Adres: Box: 152 16

161 15 Bromma/Sweden

ISSN: 0348 7385

Encama anketa me

Kwendevan û aboneyên me e-laqeyeke mezin nîşanî anketa me dan. Ji Libyayê heta Lubnanê ji Qibrise heta Kazaxistânê ji Iranê heta Ingilîstanê û Awûstralyayê, xwendevan û aboneyên me, lê-piranî ji yên Swêdê anketa me tiji kirin û di wexta xwe de ji me re şandin. Ev jî nîşan dide ku di navbera Armancê û xwendeva-

nên wê de danûstendinê beraberî hene.

Di rojnamegeriyê de danûstendinê beraberî yek ji bingehîn têkiliyên di navbera redaksiyon û xwendevanan de ye. Mahna vê têkiliyê ew e ku redaksiyon nîrîn û dîtinê xwendevanen xwe de di riya başbûn û mukemelbûna rojnameyê de bi kar bîne û dîsa ji

wan re bi riya rojnameyê paşve bisine. Anku rojname ji aliye kî zanyarı û agahdarî dide xwendevanen xwe ji aliye din jî ew bixwe hin haydarî, agahdarî û pêşniyaran werdigre. Bi saya van danûstendinan rojnameyek kemasî û lawaziyen xwe dibîne û daxwaz û "giliyên" xwendavanen dibihîse.

Di Armancê de cara pêşîn tu kijan nivîsê dixwînî
% 46 quncik % 42 nûce % 12 babeten din

Li gor te di Armancê de babetê ku kemasiyen wan hene çî ne?
ilim û teknik % 23 pirsên civakî % 41 huner % 18 yên din % 18

Nivîsen ku bi te ne balkeş in
nûce % 23.5 edebiyat % 16 lêkolîn % 12 quncik % 16 hevpeyivin % 11 dimili % 20 yên din % 1.5

Zimanê wê çawa ye?
sivik % 13.8 giran % 6.9 normal % 76.9

Mîzanpaja wê çawa ye
xweş % 20.8 normal % 62.5 nexweş % 11

Emrê te
di navbera 15-25 % 8.3 di navbera 25-40 % 55.5 li ser 40 sali % 33.7

Xwendina te
Di bin lisê % 11 Lise % 23.6 Unîwersite % 61 yên din % 4.4

Zimanê te yê malê çi ye?
Kurmanci % 80.5 Dimili % 6.9 Soranî % 8.3 yê din % 4.3
Armanca ji te re tê ji bili te çend kesen dixwînin
kesek % 43 du kes % 26 ji du kesan zedetir % 26 tu kes % 5

Tu dixwazî di Armancê de li gel Kurmanci û Dimili carna Soranî ji (bi latinî) hebe
Erê % 80.5 Na % 15 Erê, lê bi tipen Erebi % 1

Niviskarênen tênen xwestin

Herçiqas di pirsê de qesta me ne niviskarênen ku tim di Armancê de dinivîsin bûn ji gelek xwendevanan navê niviskarênen Armancê ji nivisne. Li gor rêzê ev in: Mûrad Ciwan, Mahmûd Lewendî, Zinarê Xamo, Reşo Zilan, Ahmed Huseynî, Mehmet Uzun, Malmisanij ...

Bi giştî çawa ye
baş % 65 normal % 4 bi pêşniyarên cûda % 31

Pêşniyar ev in: Divê dijîtiya niviskaran neke. Divê objektîv be. Di bin tesîra partiyekê de nebe. Cî bidin niviskarênen din. Nivîs dirêj in. Divê wêne û karîkatur zêde bin. Quncikên jin û xortan hebin.

Leyla Zana ji bo Xelata aştî ya Nobelê pêşniyar kirin

Şes parlementerên Norweçî yên ji partiyen cuda, Leyla Zana wek namzeta Xelata Nobelê pêşniyari komîteya Xelata Nobelê kirin. Rojname û telewîzyonên Norweçê li ser vê bûyerê rawestîyan, behsa Leyla Zana û rewşa Kurdan a li Tirkîyeyê kirin

Şes parlementerên Norweçî yên ji partiyen cuda, Leyla Zana wek namzeta Xelata aştî ya Nobelê pêşniyara komîteya Xelata Nobelê kirin. Rojname û telewîzyonên Norweçê li ser vê bûyerê rawestîyan, behsa Leyla Zana û rewşa Kurdan a li Tirkîyeyê kirin. Her weha li gor rojnameya "Rogaland Avis" a Norweçî (15.2.1995) heyetek ji parlementerên Norweçê ku ji Kirstî Kolle Grondahl, Kacî Kullman Five (Serokê Partiya Rast) û Kjell Magne Bondevik (Serokê Partiya Gel a Xiristiyan) çûye Tirkîyê û di vê çûna xwe de li gel konsolosê Norweçê li Tirkîyê Svein Ole Saether di girtîxaneyê de çûne serlîdana Leyla Zanayê û jê re dane xuyakirin ku wan ew ji bo Xelata Nobelê

pêşniyar kiriye. Piştî hevdîtinê parlementeran dan xuyakirin ku wê kartekirinek (tesîrek) mezin li ser wan kiriye.

Heyetê di vegera xwe de hin çalakî pêk anîn, wek li dij derketina firotina çekén Norweçî bo Tirkîyeyê. Wan dan xuyakirin ku Tirkîye van çekan li dijî gelê Kurd bi kar tîne.

Her weha li gor rojnameya "Arbeiderbladet" a Norweçî, dewleta Norweçê di van sê salen dawî de di navbera 80-100 milyon kroûnê Norweçî çek firotine Tirkîyeyê.

Serokê Partiya Çep a Sosyalist Erik Solheim, hukûmet rexne kir û daxwaz kir ku firotina çekan bo Tirkîyeyê bête rawestandin.

Soreş Fırat/Norveç



Leyla Zana

NEYNIK

Têkoşîna bê şîddet

Çirûsk

Meteloka Fransî "Ou force, raison n'a pas de lieu" bi Kurdî tê vê manê" li ku zor hukum dike, li wir cihê hiş tuneye". Gelê Kurd 70 sal berê jî di vê neçariyê de bû. wê demê pirs wek ya îroyîn bû ka meriv li dij tevkuşinê ordiya Tirk çawa dikare xwe ragire. Serhildarênek çekdar yên ku ji sala 1925'an û vir de pêketin bi tevayî şikestin. Şerîn hebûn û mayinê bûn, kîrinê parastina meşrû bûn. Bi vî awayî jî têkoşîna rizgarî li besen din yên Kurdistanê berdewam kir. Ji sala 1984'an de li Bakur jî dîsa serhildarênek çekdar bi qalibê şerî gerîla heye. Çek ji Kurdan ra pêwîst bûye wek nan û av. Wextê guftugoyen li ser vê yekê tunebûye. Dîsa jî wek gava pêşîn dixwazîm li ser şerî çekdarî; derheqê hûmîn wî mafê gelanî, yên dadmend û derheqê bi-kîrhatina wê bisekinim. Piştra ezî li ser alternatifan rawestim.

Biryara 3103 ya Civîna Giştî ya Neteweyen Yekbûyî (12.12.1973) wiha dibêje: "1.Têkoşîna gelên li bin destîn dagîrker û biyanî û li bin rejîmên nîjadperest ji bo pêkanîna mafê wî yê bixwîbîryardan û serbixweylî adil e...". Lîbelê pîrsa berjewendî û feydî şerî çekdar tiştekî din e. Ji Şerî Dînya yê Duyem û vir de hemâ hemâ qet şerekî gerîla tunebûye ku bi rastî gîhişîye armancen xwe. Heke şerî gerîla wek li Vietnamê bi serket ji, paşê di warê siyasi de binketiye.

Li ser şerî gerîla yê PKK'ê İsmail Beşikçi wilo dinivîse: "Gelê ku di nav tirs, panîk û xofe de ma, yê ku xwe tewand, yê ku hat tirsandin û baweriya wî bi xwe tunebû; vegeyiyate jînê, xwe rakiriye û doza mafê xwe kiriye(1)". Li ba vê encamî yê din ew e ku dewleta Tirk ji ber şerî gerîla ket krîza aboriyê. Dawiya dawî pîrsîgirêka Kurd tenê bi riya siyasi dikare bête çareserkirin. Ji lewra divê tevgera rizgarîya Kurd ji riyên nû bibîne. Dîroka dînyayê diqîre ku em guh bidin wê.

Mahatma Gandhi bi riya ragirtina bêzorê berê Hindistanê da serbixwebûnê. Prensîbîn wî yên xwerağırtina sîvîl" û "hevkarînekirina li gel Ingilîstanê" di forma meşen protestoyen mezin, provakasyon, girevîn giştî, dukan û kargehîn gîrî, boykotîn bacan hwd bûn. Bi vî awayî gelê Hindî ji Ingilîstan û dînyayê re "Yekbûn, zebt û xurtî(2)" nîşan dan. Belam Gandhi li ser vê yekê got: "Heke gerek be ku di navbera tîsokîli zorê de hilbijartînê bikim, min ê ji zorê ra bîrîyî bîdaya (3).

Martin Luther King jî di têkoşîna xwe ya li dij nîjadperestiyê de bêzorî wek aleta siyasi hilbijart, ji ber ku: "Ttarî ji tariyê nikare birevî tenê ronahî zora tariyê dibe (4)". Stratejiya wî bi vê şiroveya ha kifşîr dibe." Bingebla parastina me ew e ku li hember her hereketek zorê li dij bitenê reşikek, bersîva me dê ew be ku bi hezarîn din hene di şûna wî de wek goriyên potansiye amade ne. Her cara ku mamos-taye ji kar têderxistin, çimkî wî bi gernasi ji bo edaletê kar dikir, divê bête xuyakirin ku dîsa pêwîst e 4000 yên din jî ji kar bênderxistin. Çaxa ku zordar mala reşikekî bombebaran dikin, divê ewana bizanin ku gereke 50000 malen din bêtin teqandin. Ew yekbûna dînamîk, ew daxwaza êşkişandinê û ew redkirina tolê dê di demeke kurt de bibe encama ku zordar ji metodîn xwe şerm bike (5)". Gandhi jî xwest ku gelê Ingilîzî bê zor qanî bike ku nehaqî li gelê hindî tête kirin (6). Çapemeniya navnetewî ji bo xebata herdûyan alîfakareke bingehîn bû. Dewletîn biyanî ji ber ku nedîkarîn rû li zora dijmin badin û bêdeng bîmînîn, dest bi rexne û gazindan kirin.

Belam mînakîn dî yên nû jî hene. Di 9.11.89'de slogan "xelk em in zor tune" Diwarê Berlinê hat hilweşandin. Bi şeweyeke hêmîn li hemû bajarêni gîrîn ên Komara Almanya Demokratik bi sed hezaran derketin kolanan, beşdarîn meşan roj bi roj bêtir bûn. Mixabin mînakîke bervajî jî heye ku çendekê berê qewimî. Rabûna 500 000 xwendekarênen Çinî ji bo reforman ji bê zorê bihûrî, lîbelê wêneyen bîhara 89'an li Meydana Tienmenê dema tanq û leşkeran êrişî koma mezinâ bêcek kir û bi hezaran kes hatin kûştin ji bîr dike. Ew raperîna bîzorê bînket, belam Çin bêgav ma û iro derbareyî siyaseta xwe ya derive û aborî ya xwe ji bo rojavayê vedike.

Nîha mîrov dikare ji bo têkoşîna Kurdan ji wan tecrûbeyan ci fîr bibe? Di rojavayê Tirkîyeyê de bi mîlyonan Kurd dijin, bitenê li İstembolê ji sê mîlyonan bêtir in. Bîguman ji bo hereketen protestoyen hêmîn ew potasiyeleke pir mezin e. Di ser de ji çapemeniya navnetewî di şarîn mezin ên rojava kom bûne. Hewce ye ku xwe ragirtina bêzorê bi forma protestoyen mezin, grevîn giştî hwd. li bajaren mezin ên rojava bêne meşandin. İro tiştek ku gelê Kurd winda bike nema ye. Divê xelkê Kurd ji rewşa xwe ya pasîf derkeve ku ew tê de tête temirandin, tirsandin û herdem di revê de ye. Çawa ku gelê Hindî li hember kedîxwariya Ingilîzî têkoşî, çawa ku reşikên Amerîkayî li hember nîjadperestiyê xebat kirin, wiha jî divê ku gelê Kurd li hemberjenosid û etnosida rîjîma Tirkîyeyê bi riya bêzorê xwe ragire. Edî em bi gotina "xencer bira ye, tifeng pismam e" pêşve naçin. Hepiskirina parlementerên DEP'ê ji gelek bûyare dî yên dema dawî bêtir bala dinê kişand û piştigirîyeke mezintir peyda kir.

Lê gava meriv li peyvîn Martin Luther King diram e, çend parlementeran çewt restarkirin, çunki li şûna ku tenîş bi tenîş bi protesto û piştigîrî cezayen heri gîrîn pejîrandibana, yek çendek berê ji DEP'ê derket hîn jî reviyan derveyî welêt. Egera mafê Tirkîyeyê derheqê azadî û edaletê cezayen gîrî geh û idamî ferman dike, hingê cihê jîn û mîren qenc û durist zîndan û sêdare ye.

Çavkanî:

1) İsmail Beşikçi: Devletlerası Sömürge Kürdistan, r.69 2) Louis Fischer: Gandhi, r. 83. 3) Vom Geist des Mahatma, Fritz Kraus 1957 4) Martin Luther King, Steven B. Oates, r. 498.5) King's speech published in Phylon 1957, r. 25-34 6) Louis Fischer: Gandhi, r. 127.

RAMANÊN RAMANWERAN

Piştî ku min pirtûka Susan Francîs ya bi navê "Cihekî xwe veşartinê nîne" xwend, min biryar da ku çend wêneyan ji pirtûka wê, ku wê li Kurdistanê ji trajediya 1991ê bi çawê xwe dîtine û bîhistine, wergerînim. Susana ciwan û evîndar bi xwendevanekî Îraqî re dizewice û li pey mîrê xwe Ezîz diçê Îraqê. Gava Saddam êrisê dibe ser Kuveytê, Susan û mîrê xwe biryar didin ku ji Îraqê birevin. Di pirtûka xwe ya "Cihekî xwe veşartinê nîne" de Susan behsa reva xwe û ya bi sedhezaran penaberên Kurd dike.

Mebesta min ew e ku çawa hewqas êş û derdênu ku hatine serê gelê me bi van wêneyan bidim xuyakirin. Ji aliye kî dî ve ji ku çawa em Kurd û bi taybetî hêzén siyasi û serokên wan bi hesanî dikarin hewqas êş, derd û kulan ji bîr bikin, dersan jê wernegrin. Lî bi ser hewqası de jî rabin bi hev bikevin û dilê dijmin li xwe rihet bikin. Ji bo dîsa were bîra me!

ZÎWER HACO

WÊNE 1

Ew çend roj bûn benzîna tirimbîlê nemabû û imbara me ya xwarin û vexwarinê têra çayeke ku hinavê me yên jehidayî germ bike dikir an nedikir. Birçtî û tihnan hinavê me li hev dixistin û nexweşiyê û jehriyê êş hîn zêdetir dikir. Ez kîliyekê di bin kincen şil û giran de li ser xwe geriyam, li hawîrdor mirovîn birçî, westiyayî, bê taqet li ber mirinê, yan mîrî xwe avêtibûn kîleken rî. Min xwe ji awirê wan vedida, lê di bin çavan re min çavê xwe li kesekî ku tiştekî were xwarin û vexwarin jê pars bikim digerîyan. Bi min re serbilindî û qureti nemabû. Ji bo bi destxistina pariyekî nan ji mîr û zarokên xwe yen nexweş re min dikaribû her tişti bikim.

Bîhna pîsî û laşen genî firnikên mirov dadigirt û dilê min dixe-land, lê tiştekî ku di hinavê min de hebe ku ez verêsim nebû. Hin kesan ji çuqliyên şil û ter agir dadabûn û dixwestin avê bîkelînin yan jî hinek xwarinê

germ bikin. Hin kesan jî gava çav bi min diketin ji ber ku ez biyanî bûm ji qehr û kîna dilê xwe qîr di-dane min û li pey min tif dikirin. Lî êdî min nema guh dida û ne xema min bû.

Min berê xwe dida ku derê, min bi sedhezaran mirov diditîn, di nav heriyê de weke pêlên deryayê li nav hev diketin, di bin çend tew kînc û betaniyêş şil de ji ber barana bê sekîn pişta wan tewiyabû û bi heriyê û gemarê hatibûn seyandin. Mirov digot jiyan dike ji wan were mijtin û kesekî li ber xwe bide nebû. Tu hêvi nemabû. Kesî were bi me ve nebû. Em li hêviya ku laşen me xwe bisipêrin û ji êş û derdan aza bibin mabûn.

Ava jehidayî ya ku ji çiyê diherikî û tevlî baranê dibû û her tiş dikire çîrav bi hezaran mirov jê nexweş diketin. Mirov di kû re diçû dikete nav golên pîsî yên so-rezerî, ji ber ku nexweşen bê taqet ji wan nedihat dûr bikevin û xwe bidin kîlekan da xwe rihet bikin û pîsîya xwe binax bikin. Hin malbat ji wan ne dihat miriyê xwe veşerin, ew li cihê ku ji birçtî,

Ji trajediya 1991'an sê wêne

westan û bê taqetî diketin yan jî ji serma di xew de diqufilin, dihiştin.

Mîrê min Ezîz û zarok jî bi zikşê ketibûn û çime ez hîn neketibûm jiber ku ji çaxê em berî heftiyekê ji Suleymaniye reviyabûn xwarin bêje bi devê min neketibû. Min texmîn dikir ku çend seet ji Ezîz re mane ku bimire. Min tehamula ramana wendakirin û tenhayiyê nedikir, lê êdî hêsiрen min jî nemabû. Min li nexweşen tagirtî dinerî û bawer nedikir ku ezê bikaribim dom bîkim. Lî çareyeke din nebû.

Me ji kesen di pey me re reviyabûn dibihîst ku leskekeren Saddam bê rehm û bê sînor kesen ku şünde vedigerîyan îşkence dikirin û dikuştin. Digotin leskeker bi pêş ve tê û di riya xwe de gund û bajaran wêran dike û dişewitîne.

Eziz di jiyana xwe tevî de rojê pênc caran nimêj dikir, lê iro bi ser ku roja inê bû jî dev ji nimêjê berdabû. Wî bawerîya xwe bi Xwedê jî wenda kiribû û bê wê jî min nizanibû ewê çawa liber xwe bide. Eş û kulan cihê bawerîye nehiştibû.

Eziz got : " Gava hewqas tiştên xerab biqewimin, ez ê çawa bawerîye bi Xwedê bînim? "

WÊNE 2

"...Li vî welatî li ser van çiyan şer ne bi tenê di navbera çekdaran de ye." Şevekê Osman ji me re di-axivî. "Leskeker gava êris dike berê xwe dide sifilan, ji ber ku em li ber lep û desten wan in û bi hêsanî ji heq me derdikevin. Rehm di zikê wan de nîne. Ji çaxê ku tê

bîra min karê me ev e, her bi vî rengî bûye. Ezê ji we re bûyerekê bibêjim. Sala 1969'an leskekerî erişî ser gundê Dokan kir. Jin, zarok û kal revîn navsera çiyê û ji ber top û bomban xwe di şikeftekê de veşartin. Gava ew di taristana şikeftê de ji tirs û serma dilerizîn, leskeker gund dabû ber topan, dişewitand û wêren dikir. Di pey re hatin ber devê şikeftê û ji qurmê daran agirekî mezîn di devê şikeftê de dadan û benzîn berdan ser wan." Min dît çavê Osman tîji hêşir bûn, sekîn da ku bîhna xwe vede, mirov digot qey werisek di xenaqa wî de ye. Di-hate ber çavê min wê kîliyê, dayik bi ci dihesiyen gava zarokên xwe ber bi sîngê xwe ve dişidandan û guhdarî xirecira li ber devê şikeftê dikirin, bê ku mefera wan hebe tiştekî bikin.

"Leskeker agir berda koma daran," Osman domand. "û tifing berdîdan devê şikeftê da kes nikaribe bireve. Xelkê ji çend kilometran ve dûr dengê qîrîna jin û zarok dikir, gava ku ew hêdî hêdî dihatin bîraştin. Şest û heft kes di şikeftê de bûn." Osman dîsa sekîn da bîhna xwe vede, çavê wî weke du perengan sor dikirin, tîji hêşir bûn û bi pişta destê xwe ziwa dikirin.

WÊNE 3

Piştî azadkirina bajarê Suleymaniye eşq û şahiya serkeftinê çend rojan dewam kir. Leskeker û polisên ewlekariyê yeko yeko dihatin zeftkirin. Gelek ji wan jî kuşî, serjê-kirî li kuçan avêti bûn. Laşê serêke wan li meydana bajêr daleqandî

bû. Bê guman gelek ji wan xwedî gunehêne mezîn bûn û gelek ne-heqî li Kurdan kiribûn.

Bi rastî rehma pêşmergan li ser leskekeren dîl ji ya wan bixwe bêhtir hebû. Çek û solêne leskekeren ji wan hatibûn girtin û li nav bajêr pars dikirin.

Rojekê em li nav bajêr ji xwe re digerîyan, me dît komek Kurd hev û ñîn girtine û li avahîya ku berî cihê serokatiya Baasê bû, digerin. Em jî derbasî ba wan bûn. Em ji odayekê derbasî yeke din dibûn, bîhna mirinê tevlî ya şewatî dibû û pozê mirov tîji dikir. Dengê mirovîkî dihat, digot: "Sîh-çil kes davetîn vê oda teng û ew di nav pîsî de bê ronî, bê av û bê xwarin dihiştin." Dîwar bi tenî bûn, di xwînê de mabûn. Hin hepsiyan navê xwe û mesajên weke" min ji bîr nekin" di dîwêr de kolabûn.

Li cihêkî din, li meydana avahîye me tirimbêlek di rengê ereba nexweşen de dît, çend kes li ber sekîn bûn û temaşe dikirin. Bin-ciliyekî jinan bi xwîn û qetiyayî di erebê de û li derdorê wê daleqandibûn. "Ev ci ye?" Min pîrsî. Dengekî ji nav komê bersîv da: "Gava keç û jînên ciwan îşkence dikirin, ev tirimbêl bi kar danîn." Dengekî din hat û got: "Keçen ciwan ji bo kîfa serokên xwe digitin."

Ew keçen ciwan di nav destê îşkencevan de di ci halî de bûn, ku li piş dîwarên stûr dûrî dê û bavan, dûrî hevalan ji îşkencevanen wan pêve kesekî dengê qîrîn wan nedibîhîst dihatin ber çavê min.



Newroza we pîroz be

Nameyek ji Bircen Amedê *

Biracan,

Belê, Newroz îsal ji salên berê guherî hat pîrozkirin. Çend meh berê Belediya Diyarbekirê li ser daxwaza rûnişvanê Amedê bîryar dabû, da ku Newroz bi şeweckî dewlemend bête pîrozkirin. Vêca ez dê li gorî ku zimanê min bigere, taqeta min ya nivisînê dest bide, ji we re şahî û şeweya pîrozkirina Newroza îsal binim zimên. Bi nivisê, bi peyvan liberçavraxistina şahiyê Newrozê bi hemî xweşî û rengan di vê nameyê de dijwar e. Lê ji ber xusûsiyeta namenivi-sînê van rîzhan dinivîsim. Heke paşê wextê we hebe û hûn li filmê şahiyê Newrozê temaşe bikin, hûn dê têbigêhîn mebesta min ci ye.

Ez dixwazim şahî û pîroziyê vê rojê di bin çend xalan de nîşan bikim. Li vir ev tiştên, ez dê ji bo we bînim ber çavan ne yên ku tenê min bi xwe dîtine, herweha şahiyê ku li cihê din çebûne jî bi riya hevalên xwe ez dê ji we re diyar bikim. Bêî ku dirêj bikim û serê we bişenîm, de ka werin em bi hev re rasterast herin temaşaya operaya Memê Alan.

Êvara Newrozê

Êvara Newrozê, pişti ku tariyê erd hilçinî, di saet heştan de, li navenda (xanî) tiyatroyê Operaya Memê Alan desî pê kir. Li salonê cihekî tenê jî vala nemabû. Li gel ku navenda tiyatroyê cihekî mezîn e jî, cardin mirov dil dikir ku salineke mezintir dê çêtirbana. Ji ber ev cara yekemîn bû ku Destana Memê Alan li bajare Amedê bi awayekî rîk û pêk li pêş çavan mîna tabloyeke rengîn ku hunermendek rengîn xwe li ser tabloye bi sebir û diqet bi cih bike dihate vejandin.

Herçiqas êvara Newrozê bi sendan kes li ber deriyê navenda tiyatroyê, ji bo ku bilîtek bi dest bixin civiyan jî, ci mixabin hêviya wan bi cîh nehat. Ji xwe bilîtin vê şevê du meh berê xilas bûbûn. Dihate gotin ku vê carê peyayê bazara reş, reşiroş bêkar mabûn.

Ez pir dîlşikestî me, ji ber ku ez nikarim vê Operayê bi nivisê, bi hemî huner û xweşîya wê û di wexta temâşekirinê de ew hestêni bi mirovî re peyda dibin, bînim zimên. Lê belê gava mirovî temâşayî operayê dikir, mirov diçû dinya û jiyanekî din. Li wê dinyayê mîr hebûn, bi xof û heybet bûn. Jin hebûn bi rîndiya xwe hûrî(melek) bûn. Mirov geh li behestê geh li dojehê bû. Geh li xewnêñ şîrfîn, geh li zindanê bû. Xewn û xeyal, tirs û heybet, mîranî û bêbexî, qencî û nerindî, hejarî û dewlemendî, hevalî û neyarî, evîndarî û kîndarî, bi kurtî te digote mirov birek ji dîroka însaniyetê dijî. Hemî ev şeweyê tabloyan li ber çavêni mirovî şikil digirtin û dihatin guhertin. Bi rehetî ez dikarim bêjîm ku riheñ dengbêjîn me yên koçkîrî şâ bûn. Dengê hunermendan pêl bi pêl, da nav gelfî û newalan, di ser çiyan re li ezmanê welatê me bi çar aliyan ve xweşî û şadî belav kir. Dibêjin, işev li ezmanê çiyanê Agrî, stérka Ehmedê Xanî

ji her şevê bêtir şewq dida. Gelek kes kelegirî bûn. Keçen ciwan ji ber evîna Memû Zîn di wê salona tarî de bihar û payîz bibîr anîn. Xorten ciwan ji wan ne kimtir bûn. Heke dest bida dê gelek ciwanmîrân êris bibrana ser sehneyê ji bo tolhildana Memê. Belê, mirov nizane di te-masa vê operayê de ci hîs bi temaşevanan re peydabûn. Tenê Xwedê û hisdarên me dizanîn kîjan hest di ruhê wan de vejiyan...

Êvara Newrozê televîzyonê ev opera direk nîşan dida. Kesên ku nekaribûn biçine temaşê qîma xwe bi televîzyonê anîn. Lî divê bête gotin ku pişti bidawîbûna operayê, vê êvara Newrozê temaşevanîn operayê, bi xeyalîn cûr bi cûr xwe berdan nav tarîtiya şevê. Her mirovek bi xeyal û hêviyên xwe, bi ramân û daxwazin xwe kîfxweş an xemgîn...

Helbet
pîrozkirina Newrozê ne tenê bi operaya Memê Alan dihate pê. Pişti operayê li ser daxwaza hin hevalan em li helikopterekî siwar bûn da ku em gerekî li ezmanê Diyarbekirê pêkbînin û fekin, ka di vê şeva tarî de ji bilindahiyê bajêr çawa xuya dike. Li min bibihrin. Ez dînam taswîreke tê nahete pêş. Lî wek min berê jî gotibû ez dê hewl bidim da ku bi kîmasî dîmenekî li ber çavêni we biafirînim heke ev dîmen pirr rengîn ne be jî.

Li Esmanê Amedê

Belê, em bi helikopterê di tariya şeva Newrozê de li ezmanê Diyarbekirê digerin. Ji siûdê me re, tu ewrek li ezman naxuyê. şeveke çîksayî. Li ezman stérk bi hemî xweşîya xwe li me temaşe dikin. Ji her şevê zêdetir bi ronahî ne. Tu dibê qey ew jî işev Newrozê bi me re pîroz dikin. Ji jor de em temaşe dikin, bajar di nav rengan de ma ye. Ma gelo ev heftreng e, di vê şeva tarî de xuya dibe?! Na na. Ev heftreng me ye. Heftreng Newrozê ye. Belê, gava em nêzîki li bajare Amedê yê kevin, burcên li bajêrpêçayî dikin, bi xweşîya dîmena xuyayî mirov dikeve nav xeyalan. Bircen Diyarbekirê seranser-hatine xemilandin. Ronahî wek avê diherike. Bircen rengîn li ber çavêni mirov şiklîn pircûre distîn. Carina wek keziyên hunandî yên Xeca li çiyanê Sîpanê dihene xuyakirin. Heger mirov hay jê nebe ku di helikopterekî de ye, bê guman mirov dil dike xwe ji jor berde nav vê daristana keziyan... Bi tevgera helikopterê icar wêneyeke din dihê vejinê. Bircen Amedê kofiyêni jinê kurdan dihîn ber çavêni mirovî. Ew kofiyêni rengîn, bi zêran xemilandî xuya dibin. Amed li ber çavêni mirovî dibe wek jineke bedew, ku di tariya şevê de dilive. Avahiyê

bilind, keziyên hunandî, bircen belek tabloya hunermend temam dîkin. Dilê mirovî bi pêl(kel) dibe, germbûna canê mirovî bi hêzgerîna xwînê dixe bîra mirovî. Em li ezmanê Amedê, bi dilekî germ li dilê bajêr temaşe dîkin...

Li rojhelata bajêr çemê Dîcle diherike. Ji ber ronahiya bajêr, dema mirov ji jor mîze dike, dibîne ku Dîcle bi şewyeke din diherike, ronahiyê ava Dîcle guherîtiye. Ji pêl û herikandina avê nebe ez dê bêjîm ew ne Dîcle ye... Agirê Newrozê li ser burca bakur ya herî bilind bi hemî pîroziya xwe ber bi esmanan pêl dide. Tu dibê ji bo rizgarbûna Memo, Tacdîn xaniyê xwe şewitandiye. Edî Dehak li ser siniya ber xwe kakilêngûzân nabîne. Agirê Newrozê nema gozerê (dara gozê) tenê di-

bûn. Te di go qey mîregîn zozanân yên Serhedê ne, bayeke sivik vê deryaya gul û kulîkan dihejîne. Xelkê bajêr li kîlekîn rîyan temaşeyî wan dikir. Hin caran bi tilili û çepikêni xwe ew jî besdariyîn govendê dibûn.

Pişti grûbeke govendê grûbêni tiyatroya yêne pêkenînê derdiketin. Herçî bi derketina van komikan zarok geleki kîfxweş dibûn. Zarokan bi hewar û qêrîn dixwest li ser milen mezinê xwe temaşeyî wan komikên qesmeran bikin. Bi rastî wan grûbêni pêkenînê jî kîfeke cuda didan vê rojê û ji ser kîfa zarokan re tiştekî tunebû. Zarokan bi gulvedanek rengîn kîf dikir û dikeniyan...

Pişti demekê ew grûbêni goven-dê, hemî gihaştin meydana Şêx Seidî. Li wê derê serokê belediyê



hêle. Li esmanê Amedê fişekên hewayî diteqin. Belê, bi rengîn guherî li esmanê bi fişekên hewayî "Newroz Pîroz Be" dihete nivisîn. Li bin ezmanê Diyarbekir di vê şeva tarî de gelek tişt xuya dibin... Ez serê we neêşînîm.

Roja Newrozê

Wek hûn dizanîn roja Newrozê em kar nakin. Cejn e. Pişti taşte em çend heval bi hev re derketin nav bajêr. Me go ka em binêrin di vê roja xweş de Diyarbekirî çawa newroza xwe pîroz dikin. Me berê xwe da nav bajêr, bajare qedîm. Li gel ku ne pêwist e ez bêjîm jî, lê rûnişvanê bajêr bi cilêñ xwe yên neteweyî rengekî din didan vê rojê. Li ser riya xwe em pê hesiyan ku di nav bajêr de trafik rawestaye. Paşê ji me re gotin ku ji ber şahiyê li nav bajêr trafik dane rawestanê...

Bel, ez çawa bêjîm. Ji çar aliyan Amedê dîngê def û zirnê bilind dibû. Di vê roja xweş de li ser daxwaza belediya Diyarbekirê ji beledîyen bajaren me yên din grûbêni govendê hatibûn hinartin. Nuha ji çar aliyan bajêr ev grûbêni govendê bi lîstîkên xwe yên mîheli, bi hunermendî li kolanen Amedê ber bi meydana Şêx Seid diherikîn. Her grûbek bi kîmasî ji sed kesi pêk hatibû. Xorten çeleng keçen bedew mil di milê hev de pêl bi pêl di tevgerê de

gîzan, gulêni sor û xemrî diavêjîn çemê evînê... Û dibêjin her sal di bîst û yekê Adarê de Mem û Zîn divejin û li kolanen Cizîra Botan, li rex çemê Dîcleyê tenê ji yên evîndar xuya dibin...

Ji birçinan em gêj bûn... Ji kîf û şahîya vê rojê me xwarin ji bîr kir. Em rabûn çûn malê. Me bihna xwê veda û piş re li kîleka si-freyeke mîrane em rûniştin me xwarin xwar... Evarê em dê herin stadyûma mezin.

Piyes

Belê, em nuha ketine hundirê stadyûmê û em li cihê xwe rûniştine. Bîstek din dê program dest pê bike. Program ji çend babeten pêk dihê. Lî ez dê tenê ji we ra behsa piyesâ Dehaq bikim. Piyes ji alî Navenda Kulturê hatiye bi darxistin û bi şewyeke hevdem hatiye şirovekirin. Li stadyûmê cihê vala nemaye. Nêzîkê bîst hezar temaşevan dê li piyesê fekin. Herweha televizyon jî dê direkt vê lîstîkê nîşan bide.

Belê, piyes bi kêmkirina ronahiyê û bi musîkeke xof dest pê dike. Pêlén ricfê mirovî digrin. Dehaq bi hemî xof û nerindîna xwe, bi tevî leşkeren xwe ve dikeve hundir. Em niha li dînyayeke din, dînyayeke kevnar, ji vir bi hezar salan berê dijîn. Pêlén ronahiyê, cil û bergê Dehaq û leşkeren wî, motifîn xuya dibin hemî bi hev re wan hestan bi insanî re çedîkin. Lîstikyan dîpeyîvin, lê em dengê wan nabîhîzin. Ji tevger û musîkî tiştên ku rûdidin mirov ji seyra piyesê fahm dike. Ji çar aliyan meydana piyesê hêdî hêdî mirovîn din xuya dibin. Jiyana însanen wê demê xuya dibe. Em hesinkar, goçkar, şivan, cotyar, rezvan û gelek birêni din ji xelkê dibin. Dehaq ne rahet e. Leşkeren wî di lez û bezê de ne. Pêlén xofa leşkeren Dehaq tirsek mezin di nav xelkê de peyda dikin. Her roja ku diçe rûyê zemîn ber bi dojehê ve tê guhertin. Jiyana dibe ezabek giran... Pişti demekî ji xelkê hin mirov dikevin tevgerê... Musîk mirovî dihejîne... Ji çar kenarê stadyûmê deng dihê... Çirûskên agirî dixuyen... Tîrêjîn ronahiyê carna ges dibin. Bi keftelefteke mezin, di nav mij û duxanê de, ronahî tarîtiya şevê hiltîne. Dehaq û leşkeren wî nikarin xwe li ber agirî û tîrêjîn ronahiyê biparêzin. Musîk dihete guhertin. Kîfxweşî û şahî him bi musîk him ji bi piyesê dihê pîrozkirin... Bîst hezar temaşevan li çepikan didin... Amedî ji "diroka" xwe rûpelîna dijîn. Bi serbilindî û xemrevîni ji stadyûmê derdikevin. Ne dûr e ku wekî min di xewnen gelek temaşevan de ji, piyes bête dubarekirin...

Bi kurtî û bi gişti Newroza me ya îsal li bajare Amedê bi vê şewyeke hat pîrozkirin. Careke din Newroza we hemîyan pîroz be. Her roja we bi şahî û kîfxweşiyê, ji xeman bi dûr bi dawî bê...

S. ROŞAN

Diyarbekir 22-03-2021

*Ev name çend roj berê bi munasebeta pîrozkirina Newrozê li bajare Amedê, ji aliye hevalekî min hatiye nivisîn. Herçiqas xuxûsiyeta namayan taybeti be jî min bi icaza hevalê xwe ev name ji bo weşanê ji kovara ku hûn dixwînin re şand. Sernîvis ji alî min hatiye danîn.

Keça Mihemed Elî Ewnî, nivîskara kitêba "Ereb û Kurd, dijminatî yan dostanî" Duriye Ewnî:

”Heger gelê Kurd û Ereb yek bin dê bikaribin li herêmê îstiqrarê pêk bînin”

Çendekî berê Xanim Duriye Ewnî ji bo serlêdanê hatibû Swêdê. Me ji bo xwendevanê Armancê ev hevpeyvîna jêrîn pê re kir da ku wê û kitêba wê ya ku bi navê "Ereb û Kurd, dijminatî yan dostanî" di 1993 an de, li Kahîreyê hatibû weşandin, bi xwendevanan bidin naskirin û hin pirsan di derheqa vê kitêbê jê bipirsin.

Duriye Ewnî keça Mihemed Elî Ewnî ye, yê ku Şerefname û pirtûka Bilîc Şérko wergerandiye Erebî û hin karên din yên hêja kirine. Ew bi xwe ji Kurdistana Tirkîye, ji bajarê Swêregê bûye û di dema Osmanîyan de çûye Misrê û li wir bi cih bûye.

Duriye xanim yek ji 3 zarokên wî ye. Ew li Kahîreyê hatiye dinyê û xwendina xwe ya navendî li wir temam kiriye. Piştre çûye Fransayê û rojnamevanî xwendîye û di Ajansa Frans Pressê de wek pispora Rojhilata Navîn kar dike û her weha li ser rewşa Fransayê ji nivisan ji rojnameyên Misrê re dinivise.

Armanc: Di dawîya sala 1993 an de pirtûka te ya bi navê "Ereb û Kurd, dijminatî yan dostanî" çap bû. Nivisandina vê pirtûkê ji ber kîjan sedeman ket bîra te. Gelo ji ber ku eslê we Kurd e, yan ji ber hin sede-mên din?

Duriye Ewnî: Na, ne ji ber ku eslê bavê min Kurd e ev nêrin hat bîra min. Lî ji ber ku min li ba ajansa xeberan ya Fransî kar dîkir û min 27 salan li ser rewşa Rojhilata Navîn nivisandîye. Bi taybetî ji li ser rewşa Îraqê. Min li ser şerîn ku li pey hev di navbera hêzên Kurd û dewleta Îraqê de pêk hatine nivisandîye. Di destênen min de di derheqa vî herêmê de çevkanî û malumatên têr hebûn. Piştre şere Xelîcê dest pê kir û piştî vî şerî meseleya Kurdi pir pêş ket. Min wek rojnamevanek his kir ku di rojîn pêş de doza Kurdan dê rewşike giring bigre û rewşa herêmê dê were guhertin. Her weha ez tê gîhîstîm ku rewşike nuh dê derkeve rojêvê û doza Kurdan ji bo li hevkirina alîyan, li ser maseya guftugoyan bibe noqteyeke giring. Min hîs kir ku divê ez vê pirtûkê bi Erebî binivîsim û deynim ber raya gişî ya gelê Ereb. Ji ber ku tevahîya gelê Ereb di derheqa Kurdan de tiştek nizanîbûn û bêyî ku bizanîbin, ji bo Kurdan helwesten negatif digirtin. Ji bo wê ji min bîryara xwe da ku ez nêrinê xwe ji bo tiştek dîrokî û yênuh nuha binivîsim da ku di mîjîyê xwendevanen Ereb de bi vî awayî tu tiştekî tarî nemîne.

Armanc: Qasî ku bala min kişand, pirtûka te bi awayekî analîzî hatîye nivisandin. Gelo tu pirtir li ser têkîlyan rawestîyayî yan te xwestîye tu nêrînan bavêjî ortê?

D. Ewnî: Pirtûk dîroka gelê Kurd û têkîliya wî bi dîrokê dinimîne. Di pirtûkê de nêrîna bin gehîn ew e ku min xwestîye ji xwendevanen Ereb re tekid bikim ku

ku daxwazêñ gelê Kurd yên netewî bi daxwazêñ gelê Ereb yên netewî re nakevin nakokîyan. Mumkun e heger gelê Kurd û Ereb yek bin dê bikaribin li herêmê îstiqrarê pêk bînin.

Beriya îslamîyetê, têkîliya Kurd û Erebân çawa bû, û di dema îslamîyetê de çawa Kurd û Erebân bi hev re derbe xwaribûn, min xwest bînim zimên. Bi hev re rizgarkirina wan ya Qudsî min anî ziman. Ew Qudsâ ku heya iro Ereb nikarin ji destênen dijiminê xwe rizgar bikin. Di dema xwe de bi yekîtiya

Kurd û Erebân îslam serfiraz bû ew serfirazî ne bi gotinan bû... Wê demê daxwazeke Erebân ji bo bîdestxistina axa Kurdan tunebû. Lî İngilîz û Fransî, ji bo perçekirina axa Erebân û bidestxistina petrola wan ew kirin 22 dewletên cihê. Filistîn ji dan sîyonîstan, ji împaratoriya Osmanîyan qismek ax girtin dan Sûriyê, hînek ji axa Sûriyê girtin dan Tirkîye, wilayeta Mûsilî dan Îraqê û bi wan ve girêdan. Gelê Îraqê ev tiş hîç nedixwest. Bi kurtayî dema ku dewleta Îraqê ya nuh çêbû, nakokîya Kurd û Erebân dest pêkir

Dîsa min di pirtûka xwe de sedema çêbûna desthilata Îraqê nivisandîye. Di çêkirina wê de sedema pêşî hebûna petrola Kerkükê bû, ya ku İngilîzan hîn di sedsala 19'an de keşif kîribû. Her weha min rewşa nava Îraqê raxist ber çavên xwendevanen. Min têkîliya ku di navbera wela-tênen Erebân û rîxistînen Kurdan de, ji roja çêbûna Îraqê heya şerî Xelîcê pêkhatine, girt nav pirtûka xwe. Her weha min di pirtûka xwe de têkîliya Kurdan, ji Erebân re wek çareserkirina doza wan da nasîn. Min xwest îspat bikim ku

Kurd jî wekî gelên din di imaratêñ xwe de jîyane. Ji ber ku Ereb car-na dibêjin; "çima Kurd dewleke bi serê xwe dixwazin, ma kengê dewleke wan hebûye? Di jîyanê de dewleke wan çenebûye". Ji xwe dema dewleke Kurdan tunebû, ya Erebân jî tune bû. Biwêja dewletê bi xwe nuh e. Di van sed salêñ dawî de dewlet çêbûne. Berîya çêbûne dewlestan Awrûpî bi xwe di bin imaratêñ serbixwe de dijîyan. Wê gavê Kurd jî di nav sinorêñ imaratêñ serbixwe de dijîyan. Carna împaratoriyê wan çêbûne, hin împaratoriyê wan ên mezin hebûne. Di nav wan împaratoriyan de mefhûmê dewle-tê yê ku em iro dizanî, bi away-ek hiyerarşik bi uslûbê wê rojê hebûye. Ji bo ku bikaribim di derheqa van împaratoriyan de-nêrînekê pêşxim; min rewşa Kur-dîn Tirkîye, Îranê, Îraqê, Sûriyê numûne daye. Her weha min xwest nêrîneku nuh a ku pêşeroja Îraqê rohnî bike, bidim xwendevanen. Bingeha wê nêrîna nuh ew e ku, Îraq çikas serbixwe dibe bila bibe, dê nikaribe vegere rojê berê. Saddam bi xwe nikare Îraqê vegere rojê berê. Anglo merîkî pir bi hêz û bi destênen xwe

Di dema xwe de bi yekîtiya Kurd û Erebân îslam serfiraz bû ew serfirazî ne bi gotinan bû... Wê demê daxwazeke Erebân ji bo bîdestxistina axa Kurdan tunebû. Lî İngilîz û Fransî, ji bo perçekirina axa Erebân û bidestxistina petrola wan ew kirin 22 dewletên cihê. Filistîn ji dan sîyonîstan, ji împaratoriya Osmanîyan qismek ax girtin dan Sûriyê, hînek ji axa Sûriyê girtin dan Tirkîye, wilayeta Mûsilî dan Îraqê û bi wan ve girêdan. Gelê Îraqê ev tiş hîç nedixwest. Bi kurtayî dema ku dewleta Îraqê ya nuh çêbû, nakokîya Kurd û Erebân dest pêkir

yêñ hesinî nikare weke berê ji bakû heta başûra Îraqê bigire bin hakîmiyeta xwe. Tişte ku dê li Îraqê çêbîbe yan dewleke nêzîkî federalî yan jî otonomî ye. Lî rewşa berya Xelîcê, ne mumkun e li Îraqê pêk were.

Armanc: Tu ji doza Kurdan bi hêvî yî?

D. Ewnî: Berî du salan angô berî ku ez dest bi nivisandîne vê pirtûka xwe bikim, roja 6 ê ilona 1992'an de min nivîsek di rojnameya El Heyat de nivisandibû. Min di wê nivisandîne de gotibû ku li Tirkîye guhertînê giring dê çêbibin. Meseleya Kurdan dê ji Tirkîye dest pê bike û ne ji Îraqê. Min gotibû ku KurdenÎraqê ji bo doza Kurdan ji destênen wan ci dihat kirine. Zêdeyi tişten ku nuha bi dest xistine dê li Îraqê pêk neyê. Lî liberxwedana mezîn dê li Tirkîye pêk bê û KurdenÎraqê

Ey Ereb hisyar bin, dinya hatîye guhertin, stratejiya cîhanê jî pê re hatîye guhertin. Ji bo ku hûn dûrî dîrokê nekevin, divê hûn tiştên naxwazin bivînin û diveşerîn, êdî bivînin ku Tirkîye mecbûr e, hindik be jî hin mafan bide Kurdan. Ku ev pêk hat û Kurd jî di nav xwe de yek bin, dê bikaribin mudaxele bikin. Heger Kurd bixwazin bi aqîlî kar bikin, divê vê perçebûna pir nebaş berdin û di nav xwe de yekîtiyekê pêk bînin. Wê gavê ew dê bikaribin bîghîjin mezintirin mafê xwe

dê di sala 1995'an de mafekî giring bîdest bixin. Dema min ev nêrinê xwe nivisandin, hevalen min ên Ereb ên têgîhîstî ji min aciz bûn û ji min re gotin: "Tu çawa dikarî tiştên weha ne rast û xeyalî binivîsi. Tirkîye dewleke bi hêz û xurt e. Amerîka jî rê nade ku ne Kurd û ne jî mîletekî din li herêmê pêş bikeve. Min ji wan re got: "Ev tiş berîya hil-weişîna Sovyetan dibû, lê ev nuha nabe. Ey Ereb hisyar bin, dinya hatîye guhertin, stratejiya cîhanê jî pê re hatîye guhertin. Ji bo ku hûn dûrî dîrokê nekevin, divê hûn tiştên naxwazin bibînin û vedişerîn, êdî bibînin ku Tirkîye mecbûr e, hindik be jî hin mafan bide Kurdan. Ku ev pêk hat û Kurd jî di nav xwe de yek bin, dê bikaribin mudaxele bikin. Heger Kurd bixwazin bi aqîlî kar bikin, divê vê perçebûna pir nebaş berdin û di nav xwe de yekîtiyekê pêk bînin.

îslamî derdikeye rê û dixwaze cîhana îslamî bikşîne ba xwe. Lî di rastîyê de dixwaze bi navê Fari-san serkêsiya cîhana îslamî bike. Gelê Kurd û Ereb bi hev re dikarin rî li ber daxwazêñ her du alîyan jî bigrin. Min di pirtûka xwe de xwest ku vê mesajê bidim.

Armanc: Te di peyyêñ xwe de got ku Ereb di derheqa doza Kurdan de pîtiştan nîzanîn. Lî belê kesen polîşik û rîxistînê siyasiyê yên Erebân ji hebûna KurdenÎraqê û Sûriyê baş agahdar in. Tu di vî warf de ci dibêjî?

D. Ewnî: Min tevayıya Erebân qedî kir. Bi gelemeperî Ereb di derheqa Kurdan de tiştekî nîzanîn. Lî bi tevayı hemû rîxistînê Erebân bi doza Kurdan baş dizanîn û şerî wê jî dîkin. Hemû rîxistînê Erebân ji bo piştevaniya Îraq û Sûriyê bikin, şerî doza Kurdan di-kin.

Armanc: Li gor baweriya te doza Kurdan dozeke herêmî ye yanf di nav stnorîn Tirk, Faris û Erebân de tenê ye. Yan jî di nav doza cîhanê de cîh girtiye.

D. Ewnî: A nuha ev doz bûye ya cîhanê. Lî mixabin KurdenÎraqê dê bi perçebûna xwe û bi birakujîya xwe vê keyşa ku ketiye destênen wan ji dest berdin. Heta nuha cîma hukûmeteke KurdenÎraqê, Îranê, Sûriyê û Îraqê li surgûnê çenebûye. Kurd li bendî ci ne? Divê berê em rexnê li Ereb, Faris û Tirkan bîgrin divê em xwe rexne bikin. Cîma Kurd xwe nalivînin? Her car emê bibîsin Kurd hevûdin dikujin û şerî hev dîkin. Yêñ ku xwe nelivîne û ga-vêñ musbet navêye dê ji dîrokê derkeve. Ji lewra divê Kurd gavîne baş bavêjin.

Ev keyşa ku ketiye destênen wan keyseke zêrîn e. Ji bo wê jî divê Kurd rexne li xwe bîgrin û xwe ji gemara dîrokê xelas bikin. Rizgarî bi yekîtiya Kurdan ve girêdayî ye.

Amadekirina hevpeyivînê Novîn Harsan Perwîn Izolî

Xweparastina ji nexweşiya AIDS

Hevpeyivînek di gel Dr. Zahir Suran

Pirs: Ji çakiya xwe çend xalan li ser nexweşiya AIDSê ji me ra şirove bike? Di gel vê ji çawan mirov xwe ji wan diparêze?

Bersiv: Ji bo têgehîştinê, pêwîst e ku cudayı li navbera hevkirin bi vîrûsa HîV ê û di gel nexweşiya AIDS ê bizarbin.

1-Vîrûsa HîV ê birîti ye ji vîrûsa ku dibe ûsta nexweşiya AIDS'ê ye. Gelek car vîrûs di laşê mirovî da heye, bêyî ku nexweshest pê bike. Çunku nexweshest bi nîşana nexweşiya AIDS ê nake û nêzîkî 10 sal hevkirina HîVê dibe nexweşiya AIDS ê. Ji bo zanîna ku mirov tûşî HîV ê bûye, tenê li labê dijeten (anti corp) dijî HîV ê ji xûna mirovî diyar dibe.

2- AIDS ji nexweşiya kembûn û nemana bergîriya laşî pêk tê. Üsta vê nexweşiyê, coreka vîrûs e û navê wê HîV ê. Çar corêن wê hene û dibin ûsta nexweşiya AIDS ê.

- a) HîV - 1 (gelek belav e)
- b) HîV - 2 (Rojeva Afrika)
- c) HîV - 3 (Nijerya)
- d) HîV - 0 (Gabon û Kamerûn)

Pirs: Rêyên guhaştin, pêketin û belavbûna HîVê ci ne?

Bersiv: Riyên belavbûna vîrûsa HîV ê çar xal in, yen ku bi zanîstî hatine ispat kîrin.

- 1 - Bi riya sex ê (gan), li nav-

6-Germav û cihêne melevaniyê.
7- Cihêne giştî weke avrêj (W.C), destşok....

Pirs: Bi ci hawî mirov dikare xwe ji nexweşiya AIDSê biparêze?

Bersiv: Ji bo xweparastinê ji vê nexweşiyê, divêt em van xalêne he ji bir nekin.

1- Bikaranîna kondomê di dema sekse de.

2- Newergirtina xwînê, yan endamên laşî.

3- Nemaçkirin bi zimêne bo demeka dirêj.


4- Rêzgirtin ji pêwendiyâ seksî (anku jin û mîr di gel kesen dî ganan nekin)

5- Neçûna nik jinêne sozanî (jinêne xirab).

6- Bikaranîna destkêşan ji aliyê doktor û birînpêçan (hemşire) ve ku pêwendiyê wan di gel xwîn, nexweşen HîV û AIDSê yekser hene.

Pirs: Dr. çapkirina ber-hevoka te ci bû?

Bersiv: Netewa Kurd ku bêhtir ji 30 milyon û li çar parçan hatiye dabêş kîrin û hemû bindes-tê bêgane bûye. Ji lew ra min xwest ku netewa min bi zimanê zikmâki bi şêweyeka zanîstî ji nexweşiya AIDS ê têbigehe û bikaribe xwe jê biparêze.



Dr. Zahir Suran di labaratorye de

bera mîrekî û jinekê, du mîr (homoseksuel), mîrekî û gel mîrekî û jinekê (bisexuel).

2 - Bi riya xwînê, ew ji wergirtina xwînê, yan pêkhatiyê xwînê (weke plazma). Yan bi rî ya bikaranîna derziyên "Drog" (merîwane, kokaîn.)

3 - Bi guhaştina HîV ê ji dayika bi hemil di dema ducanbûne da, bo zarok.

- A -Berî ji dayikbûne
- B -Dema ji dayikbûne
- C -Dema şîrdanê

4 -Di dema çandina endaman da, wek dil, gurçık û hwd.

Mirov dikare bi awayekî baş û çalak ji van çar rîkîn pêketinê xwe biparêze û vîrûsa HîV ê bi van rîkan na yête guhaştin:

1- Maçkirin

2- Himbezîkirin, destmilkirin û hejandina destan.

3- Pêwendiyâ asayî (normal) weke bi riya xwarin, vexwarin û kuxikê...

4- Mêş û pêşû nexweşiyê belav nakan.

5- Bikaranîna amanan (firaxan).

Dr. Zahir suran 1956 li Silêmaniye ji dayik bûye. Di 1987'an de kolêja pijîşkî tekûz kiriye. Ji 1991 li Zangoya Stokholmê şehrezayî li ser xwe parastina ji HîV ê û AIDS ê wergirtine. 1992 yekem semîner bo Yekitiya Ciawnêne Kurd li Swêd pêşkêş kiriye. 1993 bo cara yekê li Kurdistanê û li xaka rizgarî, bo zangoya Silêmaniye semînerek berhev kir. Ji 1993 ta 1994 an 8xal li ser nexweşiya sex- ê bo kovara Dîdarê nîvîsine. 3-10-1993 li hevpeyivînekê Tv; a Kurdistanê besdar bûye û hingê bo cara yekê ku behsa HîV û AIDS- ê hate kîrin. Ji 1992 li ser vê nexweşiyê dest bi doktora kiriye.

Dr. Zahir suran 1956 li Silêmaniye ji dayik bûye. Di 1987'an de kolêja pijîşkî tekûz kiriye. Ji 1991 li Zangoya Stokholmê şehrezayî li ser xwe parastina ji HîV ê û AIDS ê wergirtine. 1992 yekem semîner bo Yekitiya Ciawnêne Kurd li Swêd pêşkêş kiriye. 1993 bo cara yekê li Kurdistanê û li xaka rizgarî, bo zangoya Silêmaniye semînerek berhev kir. Ji 1993 ta 1994 an 8xal li ser nexweşiya sex- ê bo kovara Dîdarê nîvîsine. 3-10-1993 li hevpeyivînekê Tv; a Kurdistanê besdar bûye û hingê bo cara yekê ku behsa HîV û AIDS- ê hate kîrin. Ji 1992 li ser vê nexweşiyê dest bi doktora kiriye.

Amadekar:
Beşîr Botanî

Piştî ku min niha li ser Hurmîz xeber da, ez dixwazim axaftina xwe ya li ser Hindistanê bidim pêş, ji ber ku ez dê di pêş de li ser bisekinim. Ez vedigerim Kermanê, bi aliyê bakur ve. Çaxê ku meriv ji Hurmîz dûr dikeve û li ser vê herêmê diçe ser rîyeke din (55), meriv digije rasteke xweş ku her şikil mîwe û fêkî tê de digijin. Lî ew nanê ku li vir ji genim tê çekirinê, ji wan kesen ku şerî vî nanî nebûne re ne xweş e. Tama wê hinek tahl û şor e. Li her derfî avgerm hene ku ji bo nexweşen û birînan tên bikaranîn. Li virê xurme û fêkîyên din ji geleb in.

Dema meriv Kerman li pey xwe dihîle û meşa sê rojan diçe, meriv rastî çoleke ku meşa heft rojan dikşîne dibe. Çaxê meriv wê rîya dûr xilasdike, meriv digije Kubînamê (Kuhbanan). (56) Ji wan her heft rojén, meriv her sê rojén pêşî kêm caran avê dibîne. Ava ku heye ji tev bi xwê ye û wek giyayê şin e. Wisa ne xweş e ku nayê vexwarin. (57) Ku meriv ji vê quł-pakê vexwo, meriv pê emel dibe û wekî din tesîra xwê ya ku di vir de hazir dibe ji wisan e. Lewra ji kesen ku di vê rîyê de herin, pewist e bi xwe re ava zêde bibin. Lî belê heywan zêde tî dibin û ava ku lê rast tên vedix-win û pê emel debin. Di van her sê rojén pêşî de meriv qet laqayî avahîyan nayê. Her der col e û hiş e. Ji ber ku ti êm û hêşinahî li vir tinin, ti heywan xwanê nakan. Roja çara meriv digije çemekî ku ava wî paqîj e dibe, ji ber ku ew av bi taybeti ji bin axê dizê (avzém MD). Li çend cihêne din ji meriv bi saya şîlahîya axê şînahîyen vekirî dibîne. Bi xêra van avzêman meriv şeman dibîne û jê pê ve her dibe av. (58) Kesen rîwingînê nêzî avê bêhna xwe û ya heywanen xwe berdin û piştî wan rojén zor xwe rihet dikin. Her sê rojén dawî ji weke her sê rojén pêşî ne û piştî dawîya wê meriv digije bajare Kobiñamê.

Kobiñam bajarekî mezin e û gelê bajêr ji misilman in. Li virê hesinê cîlakirî û gelek qenc û her wiha ney-nik têne çekirin. Li vî welati gelek andanîcium heye û li virê tutia tê çekirinê ku rengê wê gewr e û sipî ye; tevi spodium an ji xweliya sıfîr tê kîrin û tê çekirin. Ew wiha çedibe: Li vî welati çiyayekî madenî heye ku xelqê wir jê şiklek xweli dikolin. Ew vê xweliye di firûnê de bi bistên ku dûyê wan dikşîne sor dike. Ew bi biskê ve parçûm dibe û çaxê ku sar dibe, pi hiş dibe. Ev tutia ye û ew koza ku di bin aliyê qalind û zîvir de dimîne û ji firûnê dernayê ji spodium e. (59)

Cewa meriv ji Kobiñam derdi keve, meriv dest bi rîwingîtiya çoleke ku heft rojan dikşîne dike. Ev der ciyekî hiş û ziwa ye, ne fêkî ne ji dar li vir digijin û ava ku tê dîtin ji tirş û tahl e. Ji ber wê ji kesen ku di vir de herin pêwîst e heta ku karibin bi xwe re tiştan bibin. Heywanen ku pir tî dibin mecbûr in ji wê avê vexwin, lê xweşiyê wan hinek arvan li nav wê avê dixin ku ew were vexwarin. Piştî heft rojan meriv dikeve tixûbê Timocaînê ku ew ji dikeve hidûdê İranê, aliyê başûr. Li virê gelek bajar û meheleyen qewî hene.

Li virê rastek heye ku gelek xerîb e, ji ber ku li virê şiklek dar heye ku jê re 'dara tavê' tê gotin û mesîhî jê re 'Arbor secco' dibêjin; yanî 'dara ziwa yan ji dara bê fêkî'. Wesfîn ku li ser vê darê haftîye dayîn wiha ne: Ew dareke ku pir bilind dibe û gewdveyê pir qalind e. Rûyê pelên wê ji jor ve kesk in û ji xwar ve ji sipî yan ji bi gewrî ve ne. Bi darê ve qalikên ku dişibin gozan hene lê nava wan vale ye. Ev dar hiş in û rengê wan ji weke dara hejîrê (61) zer in. Di hawîrdrôrê wir de nêzî sed mîlan ti dar tunin, ji bili aliyekî ku deh mîl ji wirê dûr e. Li gorî gelê wir li wirê di nava Darifush û İskender de şerek çebûye. Di bajaran de ji bo jîyanek xweş her lazımatî peyda dibe. Hêwa wir pir xweş e, ne zêde germ e û ne ji zêde sar. Bi piranîya xwe xelqê vê derê pir delal in lê li gorî bawerîya min jinên virê di dînyê de yên herî delaltır û bedewirin.

Piştî ku li ser vî welati ji hat sekinandin, ez dixwazim qala 'Kalê ji nav çiya' bikim. Cihê ku seraya wî lê ye navê Mulehet (62) girtiye ku bi zimanê sarecanan tê maneya bajarê kafran. Ji xelqê wî re ji Mulehîdi yan ji kafr dihat gotin, her weke ku em ji hinek filehan re kafr dibêjin. Marco Polo van salixdanen xwarê yên li ser padîşahê vî welati ji merivîn cure cure sa-kir. (63) Navê wî Alo-eddin bû û dînê wî islam bû. Ewî di navbera du çîyan de, li cîhekî gelek xweş baxçeyekî pir şerîn û delal dabû çekirinê. Di nav baxçê de fêkîyên herî xweş, gul û çîçekên herî delal û bi bêhn digihîstîn. Di wir de gelek koşk û serayen mezin û piçûk hatibûn avakirinê. Ew wek eywanan raserî hev hatibûn avakirinê, bi wêne û şiklên ji zêr û hevrîsim çekirî hatibûn xemîlandinê. Meriv di nav van avahîyan de geleb kanîyên avxweş didit. Li aliyê din ji kanîyên ji şerabê, ji şîr û ji hungiv hebûn. Di serayê de keç û jinên herî bedew ku karibûn bistrana û her înstrûmenten müsîkê lêxistina, her şikil reqs û govendên xweş

bileystina û kêt û şahîyê li dar xistina di jîyan. Wan jinê delal û bedew di cilên xwe yên delal û biha de, di nav baxçeyan de kêt û henek dikirin, dengê kêt û henekên wan di nav baxçeyan de şîqesîq dikir lê qızîn ber desten wan di hundir de diman û qedexe bû ku xwe nîşan bidin.

Sebebê ku padîşahê welêt dihiş baxçeyekî wisan bê çekirinê ji ev bû: Mihemed Pêxember soz dabû ku ew kesen ku herin ser ola wî û di rîya wî de bimeşin, dê li bihişte her xweşiyê nefsanê bê ber desten wan û dê jinê bedew ji wan re hevalî bikin. Ü niha padîşah ji dixwest bide bawerkirin ku ew ji pêxemberkî wek Mihemed e û qeweta wî ji heye ku kesen bi wî bawer in, li vê dinê bive bihişte. Lî ji ber ku ti kes bê destûra wî nekeve vê newala xweş, ewî koşkeke ku kes nikaribû têkevî dabû çekirinê. Tenê rîyeke wê koşkê hebû û meriv tenê di rîyeke bi dizi de karibû biçûna virê.

Padîşah di seraya xwe de çend xorîn salen wan di nava 12 û 20 an de xweyi dikir. Ewî wan ji nav xelqê nêzî wî çiyayî girtibû û tevan ji di leystikên şeran de gihiştîndibû; ew her wiha bê tirs û geleb bi qewet bûn. Padîşah her roj ji wan re basa waazên bihişta Mihemed û quđreta xwe û hukmê xwe dikir û sozê ku wan bive bihişta xwe dida wan. Carina vexwarinê xewê ji nav wan şagirtan dida 10-12 xorîn û dema ew di diketin xewa wek mirinê, wan dişand odayen di nav baxçeyan de. Çaxê ew ji xewa xwe ya kûr şîyâribûn, his û fîkrîn wan ji tiştîn ku ji wan re habîbûn gotin û ji jîyana niha re serxweş dibû. Dora her yekî ji wan qızîn bedew tije bûbûn. Qızîn şîpehî ji wan re distriyan, bi wan re kêt û henek dikirin û bi hezkirina xwê, wan ji hiş dibirin. Her wiha ji wan re xizmeta xwarînê xweş û şerabê nadîfe dihat kîrin heta ku ew serxweş dibûn. Ewana di nav çemî şîr û şerabê de xwe li bihişte dihesibandin û qet nedixwestin dev ji vê kêt û xweşiyê berdin. Piştî çar an ji pênc roj derbas dibûn, ew disa diketin xeweke kûr û ji nav baxçê dihatin derxistin. Piştî padîşah wan carek din dixwest hizûra xwe û ji wan dipirsi ka ew bi kur ve çubûn. Her yek ji hinda xwe ve wiha bersiv dida: "Ez bi quđreta padîşahê xwe li bihişte bûm." Ü piştî ji tiştîn ku di serê wan de derbas bûbûn ji civata padîşah re bi zimanekî xweş digotin, civatê ji bi guhîn me-raqdar wan guhîrî dikirin. Piştî padîşah li wan vedi-geriya û ji wan re wiha digot: "Pêxemberê me soz daye ku ew kesen xwedayê xwe bi hebîne, ew dê here bihişte, û ger ûn di emrê min de bin û li gora min herin ev xweşiyâ li gora dilê we li benda we ye."

Bi van gotinê xweş, her kes hazir bû ku ferma-nen wî bi cihî binin û xwe di ber wî de fîda bikin. Piştî çaxê ku ew ji mîr û begêna dora xwe aciz dibû yan ji yekî ne razî bû, wan bi zilamîn xwe yên qatil dida kustin. Ti kesi ji tîrsa jîyana xwe newêribû berê xwe bidana wî, ewî ji ji bo ku fermanen xwedayê xwe pêk bîne ti qîmet nedida wan. Bi vî awayî zîlm i zorîya padîşah di welatîn dora wî de pir girantir û zor-tir bû. Her wiha du karmend an ji walfiyen wî hebîne, yek ji wan li nêzî bajarê Şamî dima û yê din ji li Kurdistanê. (64) Her du walfiyen ji ferman û planen padîşah ên nîvîsi pêk dînaîn û xoran bi ser nermî (hîlîm) û di bin emran de digihîstîn. Ü çiqas bi qewet bûn ji, ger yekî xwe ji 'Kalê ji nav çiya' re biker-îneyar û têketîna defterâ wî, dê ji aliyê qatîlen wî ve bihatina kuştîne.

Welaî wî diket nav împaratorîya Ulaû (Hulagû Xan), birayê xanê mezin Mangus. Ew piştî bi van bûyîren ku çedîbin hisîya û her wiha pê hisîya ku vî padîşahî ji xwe re leşkerekî çekirîye ku kesen di nav welaî wî de derbasîbîne, wan dişêlinin. Li ser vê ewî di sala 1262 (65) yan de qewetek ji leşkerê xwe şand ser kela wî ji bo ku dora wî bigre. Lî kela wî wisan saxlem hatibûn avakirin ku ewî sê salan li ber xwe da, lê dawî ji birçibûn teslim bû. Padîşah di hepsî de hat xeniqandin, kela wî bi erdê hat hilweşandin û baxçeyen bihişta wî hat xirakirin.

Têbiñi:

55) Li gorî Franchi meşet li vir nîya dijîl û emîn ku dije Sâidabadê ye. 56) Kobiñam li gorî nêşeyen nûl Kubâberan tê nîvîsan û li navbera Yezd û Kermanshah têkeve.

57) Li gorî Sven Geden, ev nîvîli ser çola Kermanê rast e û ew bi xwe

Çand û wêje

Dr. Ebdulbasid Seyda:

”Di nav civata Kurdî de ramana felsefi lawaz e”

-II-

Armanc: *Di navbera mîtolojiya Kurdî û lêkolînên şûnewarî (Arkeoloji) tu peywendi hene, ma gelo tu hewldan ji alî dagirkirêñ Kurdistanê ji bo veşartina nasnameya wan lêkolînan çêbûne yan na?*

E. Seyda: Bi xwespartina li ser agahdariyê ku iro li ber destîn ên li ser dîroka kevnar a rojhilata nêzîk, tê xuyanî kirin ku Kurdistan bî sînorêñ xwe yên anuhayî di cîhanê de wek gi-ringürîn navçeya şûnwârî, têt hejmartin. Di vê navçeyê de gelek şaristanî ges bûbûn û herifi bûn, li gor pîvanê serdemêñ kevnar vê navçeyê gesbûneke aborî pir taybetmend dîtibû ”Cirmo” li Kurdistanâ Iraqê kevintirîn niştegeha çandiniyê bû; di dîrokê de.

Her weha li ”Çaxirbazar” li herêma Amûdê çend şerbik û qehfîkîn şûnewarî hatine dîtin ku ji-bermayêñ hezara çaremîn a berya zayînê ne.

Ji alîkî dî ve, vê navçeyê gelek ser û ceng û peywendiyêñ diplomasî yên di navbera dewletêñ wê demê de, dîtiye. Medî, Mîtanî, Orarto ligel dewleta Aşûri li vê navçeya ku iro jê re Kurdistan têt gotin, bûn, yan jî cînar û tevlîhev bûn, ligel vê jî gelek mîletêñ dîtir hebûn ku roleke baş di dîroka Mezopotomya de û di ya navçeya rojhilata nêzîk de lîstine, li Kurdistanê jiyane wek kaşîyan ên ku dewleta pêşîn a Somerîyan herifandin. Wek Kutîyan ên ku dewleta Akadî herifandin û wek Hisîyan ên ku wexyekê desthilat-dariya wan hetanî Misrê gîhişt.

Îca tiştekî pir normal e ku navçe bi şûnewaran dagirtî be, ev ji dîroka wan mîletêñ kevnar ên ku lê jiyane diçespîne. Ew mîletêñ ku gerek beşekî mezin ji wan bapîren Kurdistan iro bin.

Ew girêñ ku iro li Kurdistanâ Iraqê û Sûryê û li başûri Kurdistanâ Turkiyê belavbûyi ne reng e ji bo xelkîn cî tiştekî asayî be, lê her girek ji wan giran, di hinavê xwe de, ji bermayîyê şaristanîne cihê-cihê, hiltîne, qonaxêñ renge reng ên dîroka wê navçeyê bi cîh dike.

Em tev dizanîn ku çawan xelkîn cî, her dem û demekê, gava ku bîrek an gorek dikolan, ku çawan rastî pelik û qehf û entîkan dibûn. Yan jî gava ku axa gir ya reş dikolan da ku xaniya pê biseyînîn çinkî axa reş ji bo baranê ji ya sor çêtir e, axa sor ya ku navçe pê binavûdeng e, ev ji nîşane ku belkî ew axa reş ji ci-hekî dî hatibe guheztin ango çêkiri ye ne Xuristiyaneye. Ev bi xwe ji dîbe şahid ku ev navçe bi şaristaniyê xwe pir kevnar û pir balkêş e.

Gelek Arkeoloji di van giran de xebitîne û gelek lêkolîn belavkirine. Balkêşirîn herêmîn şûnewarî yên li Kurdistanê yên ku têñ nasîn ev in: Tilhelef (Serê Kaniyê). Çaxir bazar (Amûdê) girê Mozan (Amûdê). Lêlan (Qamîş-

lo). Erbil, Navçeya Şehrezûr (Kurdistana Iraqê) Darê (Kurdistana Turkeyê) û navçeyen Bêstîn û Taqbastan û Qesir Şérîn û Kerefto li Kurdistanâ Iranê. Lî iro dagirkirêñ Kurdistanê bi hemî hêzên xwe dixebeitin daku rastiyen bi-guherînin û hewl didin da ku wan tişten ku kevnariya gelê Kurd eşkere dikin, veşerin. Hergav lêkolîna zanîstî ji bo armancê xwe yên siyasi pêk tînin lewra careke dî, li vir, pêwîstiya mesela kelepor ji bo me ron dibe. Pêwîst e ku em dest bi xwendin û lêkolîn û lêgerîna keleporî bikin, bi awakî rêzanî, bi zanîstî û bi berfirêhî. Bê guman dê Mîtolojiya cihêkî gi-ring di vê keleporê de bigire, lîgorî sewyeta pêşveçûna alavîn derbirînê di wê çaxê de. Mîtolojiya Medya û Kaşîyan û Hisîyan û Hüriyan ji mîtolojiya mîletêñ dîtir yên navçeyê ne cihê ye, bi taybetî ji alî bîr û baweriyê xurîstî û sêksî, û ji alî meselîn afirandina gerdûn, xêr û şer û rola mirov.

Ez dikarim bêjim ku hê gelek destan û mîtoloji çavîrîmana lêkolîn û lêxwendinê dikin û dûbare-kirina xwendinê jî; herwiha xwendina Mîtolojiya berdest ji hê ne-ghîstiye sewyeta ku têt xwestin.

Armanc: *Tu bawer dikî ku rojekê felsefeyeke kevnar a Kurdî hebû, herwiha tu bawer dikî ku iro felsefeyeke Kurdî ya nûjen heye?*

E. Seyda: Li gorî wateya naskîrî, felsefe, li hemî rojhilata nêzîk i kevnar derneçûbû. Ev derneçûn ji ber sedemêñ objektif bû ne ku subjektif wek carcaran piştgîrîn navendeya Ewropî dibêjin, sedemêñ serekî yên derneçûn e in:

1- Di navbera hêzên civakî de dîmenêñ çînî xweş diyar nebûbûn û ne jî bi gewde bûbûn. Di rojhilata kevnar de û di Mezopotomya û Asya piçûk de (Kurdistana iro) dîlîti nebûbû sêweyekî berhemdar i berfireh. Dîl jî nebûbûn hêzeke aborî di meydana karêñ destane (Karêñ bi dest). Dîlîti bi giştî ne herdemî bû, û di navbera dîlan û serbestan de sînor zîbeqî û ne diyar bûn. È azad dikare di şer de ya jî ji ber deynan bibe mirovî dîl. È dîl jî di barûdoxêñ cihêreng de dikare azadiya xwe bi dest xîne - wek dana peran, zewac, karekî taybetmend, Fermaneke qîralî ku di mûnasebetekê de dikare dîlan azad bike.

Lê eger em li Yewnanê temaşe bikin, rewş berevajî têt xuyanî kirin. Di kar de dabeşkirineke dijwar di navbera xelkîn ku dixebeitin (wek kar) û xelkîn ku difikirin xuyanî dibe. Vêya hiştîye ku komek ji xelkî ji bo téramandinê û ji bo ji nûve edilandina wêneyen derûn yên hiş û hîz, bi awakî rût (mûcered), vala bibin. Çinkî felsefe di bingeha xwe de danûstandîne bi bîrû baweriyêñ teorî yên rût re dike. Ew di ser realîta berbiçav re dibîne digel ku derbirîna wê realîte bi xwe ye jî.

2- Hişmendiya olî ya kev-neşopî! Mebesta min hêza izgeha oldarî ye, li rojhilata nêzîk a kev-nar. Çinkî ev hêzaya xwe berdide hemî alîyêñ jiyana civakî. Ü Mîtolojiya jî ji bo nêrînê xwe bi-karanî, hetanî wê pileya ku, pir zor bû ku çalekiyeke hişmendî li dervî çarçewa müeseseya olî pêk bê. Vêya hiştîye ku ew belkoyen (ihîmalên) çêbûna hişkî rexnek-ariyane beravêtî bibin. Çinkî eger ew hiş derbiçûya dê bikarîbûya zemînek bo hewldanê felsefi da-mezianda.

3- Hişyariyeke dolmend bi dû hev de û bi hevdû girêdayî çêne-bûbû, ev jî ji ber berdewamiya şer û talanêñ ku navce di nav wan de dijiya.

Anuha ew agahdariyê ku ez bikaribim xwe bispêrim ser wan û bîbêjim ku fêlosêfê Kurd di wan serdemêñ bûrî de û di yên navîn û di yên nûdem de, hebûn, nîn in. Renge di pêşerojê de lêkolînê şûnewarî û xwendinê teze yên deqêñ kevnar ji me re tişten nû eşkere bikin.

Armanc: *Baş e. Da ku mijara hevpeyivînê zelaltır û dolmend-tir bibe ez dixwazim di vê navberê de tu bi kurtî li ser felsefê bipey-ivê, wate felsefe çi ye?*


E. Seyda: Bi awakî giştî, felsefe şyanek ramani teorî ye. Xwe dispêre ser baweriyen rût wek alava guftûgoyê, li ser mijaren çarenîsî yên mirov radiweste: Hebûn, hişyari û zanîn, nirx, û gelek babetîn ku ji wan derdiçin wek: Pêwîstiyê, mehalê, mumkun, rîjeyî yê (nisbî) û rehâyî (mutleq), maf û xêr û spehîbûn û mirinê.

È Fêlesof bi lezgotinê û bi nîşankirina rût razî nabe, û serê xwe li hember hişê radest xwaz û ne rexnekar, danaxîne, lê ta dawî bera dû ramanê dide bera dû besen wê û belkoyen wê dide, wek min got: Xwe dispêre ser baweriyen rût alava guftûgoyê, ji hevxistin û li hev siwarkirinê, jîderkirin û pêdeçûnê bikar tîne, îca felsefe bi wateyê tenê li Yewnanê derçûye, lê Yewnanî jî bi xêra wan çavkaniyîn baweriyê yên ku ji civakîn dîtir

Hatîbûn, bi taybetî rojhilata kevnar û nemaze ji Mezopotamya, û Asya piçûk gihiştin wê qonaxê, wek nimûne: Talîs li Melatayê jiya bû û ji bîr û bawerî û nexşeyen Stêrkzanî yên Babilyonan sûd wergirtibû. Sofoklis li ser Medya peyîvî ye û Zînifon li ser welatê Kurdan.

Armanc: *Ehmedê Xanê fê-losof e. Ev hevok têt xwendin û bihîstîn. Di Mem û Zîn de û di Dîwana Cizîri de mirov pêrgî ge-lek bîr û baweriyêñ felsefî dibe pirsa min ev e: Di çarçewa teorî ya felsefê de mirov çawan dikare bi wan bîr û baweriyen re dan û standinê bike?*

E. Seyda: Gelek dixwazin Xanî û Cizîri û Faqê Teyran têxin



Dr. Abdulbasid Seyda

rêza Fêlosofan, wek ku hin di-xwazin Mûtenebî û Meerî ji wisa bikin, lê ya rastî ew e ku ev kesana bir û baweriyen ku dikevin çarçewa pend û şîret û lahûtê pêşkêş dikin. Îca bir û baweriyen wan dibin hewldan û pêşgotine felsefi-yane, dikarîbûn bibana seretayiya ramaneke fesefî bo pêşerojê, lê mixabin ku berdewam nebûn.

Armanc: *Ez dixwazim ku em vegeerin ser felsefeya Kurdî ya iroyin, ma gelo tiştekî ku em jê re bibêjin felsefeya Kurdî heye yan na?*

E. Seyda: Digel ku iro di civata me de gelek kesen pîspor yên ku guh didin ramana Felsefi hene, lê di bawerîva min de iro di nav civata Kurdî de ramana felsefi lawaz e, di rewşike ne balkêş de ye. Hemî lêkolînê ku iro li ber dest in, yên ku xwe dispêrin ser Kurdayetîyê, ji çarçewa (teqlid) û mîzgînîdanê derneçûne, nikarin bîghêjin kûrahîyê, li taybetmândiya Kurdî nagerin, daku em bikarîbîn wê di cihê wê xuristî de bi cî bikin, ji alî cedeliyeta gitî û taybetî.

Bi kurtî, ez dibêjim: Berhe-men felsefî yên ku lêkolîngerên Kurd li vir û li wir pêşkêş dikin bîna civat û komela Kurdî ji wan nayê, nêrîna mirovê Kurd di jiyanê de di wan de nayê eşkere kirin. Reng e hînek bipirsin mane fel-sefe xwe di ser realîta berhest re dibîne. Raste, lê felsefe ne fantazî ye ku ji bo xwe ya xwe têt bikar-anîn. felsefe derbirîneke teorî ye li piş realîta ber bi çav e, bi awakî rîjeyî (nisbî) ji wê realîte cihê dibe da ku careke dî lê vegere û wê bi alavin rêzanî û hişyarane dolmend dike ku xwe binase. Wexta ku em Higel an Nietzsche dixwînîn em nikarin rewşa civakî ya wî wextî jîbîr bikin, herweha bi nisbetî Birgson û civaka Fîransî yan jî W. Jims û civaka Emerîkî. Li eger em li civaka kurdi temaşe bikin, em li gor

pîvanin naskîrî yên felsefi, nikarin pêrgî feylesofan bibin. Lê çend lêkolîngerin ku ramana felsefi pêşkêş dikin hene. Eger em li ser berhemin wan kesan jî rawestin em dê bibînin ku xwe bi mijarîn civaka kurdî mijûl nakin, li ser mijarin giştî radiwestin û eger tiştekî taybetî jî li cem wan hebe dê ji bo civaka serdestan be, mebesta min serdestin ku çanda xwe li ser gelê Kurd ferz kirine. Li Kurdistanâ Iraq û Sûryê çanda Erebî serdest e, û likolîngeri Kurd alavin xwe ji ramana felsefeya erebî werdigire. Li Iranê çanda Farisi ye û li Kurdistanâ bakur çanda tîrkî ye.

Ez nabêjim ku pêwîstiya naskîrî û zanîna çanda wan mîletan nîne, ez ne piştgiriya tenhatiya netewî dikim ango her mîletek gerek xwe di qalikê xwe de biparêze, çinkî danûstendin û têkiliyên şaristanî di nav mîletan de pir giring in bi taybetî li Rojhilata kevnar a ku li seranseri serde-man di nav tevlîhevî û peywendiyêñ şaristanî û çandeyî de dîroka xwe berdewam kiriye, carina bi aşîti û gelek caran ji bi koteke.

Lê ku em taybetmendiyêñ xelkê bizanibin tiştek e û ku em taybetmendiyêñ xwe nîzanibin tiştekî din e. Bi rastî likolînê civakî, aborî, psîkoloji, siyasi, felsefi, yên ku ji rewşa kurdi dest-pêdikin pir û pir hindik in .

Reng e di warê wije û dîrokî de me hin tiş pêkanîbin, lê di wan waran de ji kimasî pir in, xebata ku hatiye kirin hê negîhiştîye gonaxa seretayî û ne jî gihiştîye wê sewyeta ku bikaribe li beramberî êrişa iro û ya pêşerojê raweste çinkî astengîn pêşerojê dê berfireh û mezin bin, bêguman dê pir mezin bin.

AMADEKAR:
EHMED HUSEYNİ

KERÎM XANÊ ZENDÎ (1760-1779)

Ev hikumdarê mezin di pey kuştina Merdan re, bi serê xwe, bû xwediye erk. Lî serokên eşira Tirk Qecer, ku yên herî tehlûke Azad Û Muhemed Hesen bûn, di demeke kurt de jê re sergê-jayî derxistin. Zor danê, ku koçî Şirazê bikin. Lî ew li wir, soz dayînê û bi zêran di kirîna Qeceriyan de bi ser ket, heta ku ew bi xwe mecbûrî revê bûn û yek ji wan di rî de hate kuştin.

Kerîm di nav bera noz-deh salan de bêyi ku formel bibe şah, welat îdare kir. Wî xwe tenê "wekil" yan ji "hikumdar" da naskirin. Wî, ew çarsuya (çarşî, su, çarcı) Şirazê ya bi nav û deng da lê kir.

Ew ji aliyê nifşen nû ve bi kubarî û bi dadmendiyê hatiye rûmetkirin.

Di wê dema tarî de ew, yek ji yêñ bê dexme û paqitîrîn şexsiyet bû.

Kerîm Xan di 1779-an de, li paytexta xwe çû ser heqiyê.

ALÎ MURAD (1780-1785)

Di pey mirina Kerîm re demekê şerê text û tacgiriyê dom kir. Birayê wî Zekî bi Ebul-Fath Xan re salekê erk xiste desten xwe. Birayê din Muhammed Alî ji formel bû şahê hikumeta pêkve. Lî vê carê ji serokê eşira Qecer kurê Muhammed Hesen, axa Muhammed serê xwe rakir.

Zekî, birayê xwe Alî Murad şand ser. Lî zilma Zekî gîhaşte kérteke herî bilind. Li bajarê çiyê, Yezdîkana bê sûc, kuştin kir, hijdeh serokayetî ruxandin û destûra leşkerê xwe yê bê nizam, da ku dest biavêjin qız û jinê malmezinê bajêr û kesen pîroz.

Ev trajedî, ji bê fahmî, bi jiyana Zekî bû mal.

Kurê Kerîm yê mezin Sadîq Xan ji (1779-1780) ber bi Şirazê ve lezand, Ebul-Fathê neşareza ji text anî xwar û keyitiye gitte ser xwe. Piş re Alî Murad heta 1785' an şahîtî kir. Serkeftina wî ya pêşin li hember axa Muhammed bû, Tehran jê stend. Di rîwingiyeke ji Tehranê berbi Esfahanê ve, ji nişkave, di rî de mir. Caferê kurê Sadiq derbasî cihê wî bû, ku ew ji di demeke kurt de bû gorîyê jahî kirinê.

Paşê kurê wî Lutf Alî Xan şahîtiya xwe eşkere kir.

LUTF ALÎ XAN (1785-1795)

Ev cengawerê ciwan, mal mezin bi ronahî pişti mirina bavê xwe, di bîst saliya xwe de li ser textê şahitiye runişt.



Kerîm Xanî Zendî
Ji ansiklopediya "Persia The Immortal Kingdom"

Dema ku wî êrîş bir ser Şirazê gel bi şahî ber bi pê çû, wî pîroz kir. Nav û dengê wî ewqas belav bibû, heta ku çend meh derbas nebû axa Muhammed bizav nedikir ku êrîşê bibe ser.

Yê ku wê Tehrana heya wê çaxê bi qîmet, kire paytexta welêt ew bû. Lî carna rewşa wî ji nebaş dibû û carekê temamiya supayê (ji xeynî 70 kesen pê re rast) pê re xiyanet kir. Wî bi vî leşkerê hindik, bi mîrxasî, li ber xwe da û di dawiyê de leşkerê Qeceran perçiçand 1792. Vê carê Axa Muhammed bi xwe ber bi vî şovalyeyê ciwan ve çû, deriyen Şirazê bi xayintî jê re vekirin û Haci İbrahîmî xayin bi xwe bû wezîrê wî.

Carekê Şah derket derveyî sînor, lê dîsan bi paşve vege riya. Bi tevî ku Axa Muhammed bi leşkerê xwe ve ji şer re hazir bû ji, wî Kirman jê sitend. Li wir ji bi xayintî jê re derî vekirin. Vi Şahê ciwan li meydane sê seatan şer kir, li dawiyê de hespê xwe sererast ajote ser dijmin û tenê bi sê serbazên xwe ve

Çavkanî:
Åke Ohlmarks, Alla Irans
Härskare, Sjöstrands Förlag,
Printed in Sweden, Bonniers Gra
fiska Industrier AB 1979 Stock
holm. Bi zimanê Swêdi (Ji arşîva
Lutfî Baksî)

Wergêr:
Şefik Kaya

Mêvandariya Sazbendê Kurdî Huseynê Tewfo

Lewendê Dalîni

Huseynê Tewfo sazbendeki Kurd e li Qamişlo rudine û ji sazbendêne bijare ye.

Bêndererek tütin danîbû ber xwe û cixare dipêça, de-ma em derbas bûn mala wî, bi xêr hatin li me kir û di ber pêçana cixarê re min çend gotin pê re kirin. Ez gelek kîfxweş im ku bi vê helbesta seydayê nemir Cegerxwîn dest bi gotina xwe bikim.

Di tarîka şeva hicran çiraxek sîfet im ya reb

Ji ser heta piyan arhe bi carek vêketim ya reb

Bavê Azad, ev helbest dema te cara yekê bi saz û dengê xwe got û seydayê Cegerxwîn deng kir, Seyda pir pê hate hejandin û got: "Huseyin, welle ez ji dengbêj bûm û di xortanî de min gelek stran digotin û min xwes dikirin lê ev helbesta ku dema min nivîsand, heftê ji sedî min xwe tê de dît, lê bi dengê xwe te hiştiye ku ez sed ji sedî xwe tê de bibînim û Seyda spasiya te kiriye, em ji spasiya te dikin ser hemû helbesten ku te, awaz kîrin û bi dengê xwe gotin weke: Felek destê xwe nadî kes bi lava / Ez li vir dîber li Şamê / Sorgil ji bax im / Newroz e sibe herkes wê bê cem te Şêrinê / Bayê li me da û em dane ber xwe û revandin û whd.

Jiyana wî: Di sala 1945 a hatiye dinê li ber destê sazbendeki Ezidî (xellî Muslit) ji gundê Tilkatunkê, gundek ji ê Tirbespiyê, hîni temburê dibû, xwendevaneke ne akademî ye dibêje: Di dema ku min dest bi sazê kir pîrre sazbendêne me di wê demê de starênen folklorî digotin, li rádyoya Kurdi me guhdarî dikir, sazbendêne weke; Mîhemed arif, Seîd Hemo Cizrawî, Kewis Axa, Meryem-Xan. Di peyre me li stranê Soranî li çend hunermendant weke: Şemal saîb, Hesen



Zirek guhdarî dikir.

Demek dirêj bûrî bû bi kûrbûn li ser stran û folklorê xwe yê Kurdi em rawestîyan, peyre me dest bi çêkirina awaziyê kir û despêka wan helbestvanê wek Seydayê Cegerxwîn, Xelîlê Sasûnê, Hâdî, Ehmedê Şêx, Keleş û (nihâ li ber destê min hinek helbestê helbestvanê nû ji hene).

Di warê welat parêzi de: Hemî rengê folklorê Kurdi weke: stranê paleyê ên şera, stranê ser bûka, bêlûta feqa, ên dana, stranê evînî (lawîk) û ên destara me tev dane hev û parastine û bi alîkariya Dr. M. Ezîz Zazî em ê wan di riya (NOTA) bi cih bikin.

Sala 1979 me komeke reqs û folklorî me bi navê NEWROZ damezrand. Du kaseten min ên folklorî hatin amadekirin û belavkirin. Heta nuha pênc kasêt hatine belav kirin.

Digel van karê Bavê Azad ji, tim ew bi saz û awazên xwe beşdarî cejnê weke; derbasbûna sed saliya Mî Celadet, cejna jinê cîhanê (8'ê Adarê) û cejna Newrozê û gelek cejnê gelêri dibe.

Di dawî de em spasiya Bavê Azad dikin.

Heyva Ji Nêrgizan

Erê tu bawer dikî
Binê heyvê
Ji nêrgizan e??
Û dîwarêne wê ji xunava çiya ne?
Bi textên beybûnan
Law re êxistiye!!
Zêrevanekê bivir di her du destan de
Li ber dergehê wê
Rawestaye
Û li eywana wê ya berdayî
Periyê ji hingînî ne
Yên çav zîlkanê
Digel dengen ji pişt
Dîwarêne xunavê
Xweş dihêن
Dikin..
Erê tu bawer dikî??

Hesen Silêvaneyî
Duhok 1986

QERTEL Ü LİY

Arêkerdox: Se'îd VERROJ

Cay bî, cay çinibî; vanê yew liy (lîy) bî, zaf jêhaû bî, zaf xebitayinê. Cay ne çekalî û ne sewli verdaynê.

Vanê rojî yew qertel museletê ja bî, xwi pîze di va "ez çi ena serî ser di bîyara?", "ena cay çi nêverda". Qerteli xwi sere di yew pilan viraşt û agêra tira va:

-Ti nêwazena ma xwi rê bibê way û biray cê?

Lîy va: -Xwira ez yew sey to geyrena ki ma wayê û birayê ronê.

Qerteli va: -Verê ti bê key mi. Ez to da'wet kena.

Lîy va: -Wa bo. Ez yena.

Qerteli va: -Ti senî yena?

Lîy va: -Ez yena. De Hûmay çi qismet kerdo ti ko bihedirnê û mi da'wet bikê. Ma way û biray yewbinan ê.

Qerteli va: -Wa bo. Çiman ser.

Vanê qertel şî keye di hazireya xwi dî: Nehî tîrêna, gilgil tîrêna û çi-mîyo ki nikûla jê bide resena, ay çi hedîrnay û ard dekerde teht ser, veýnda liy da, da'wet kerdi keydê xwi.

Lîya to amê ewniyay ki, e, qerteli de rê çiye-ponj bêjî wer ro-nayo feqet tede çiyo ki liy bişeno boro çînyo. Pêro werê qerteli yo.

Qertel tadiyeno tira vano: -De waya mi, roş, ma nanê xwi borê.

Vanê liy ziwanê xwi tehta wişk ser ra çarna, de çi nêdekewno fektê ja. Qertel zî pê nikûlda xwi tiko, tiko çiyo ki liy rê hedîrnabî, pêro jê werd û tadiya liy ra va:

-Waya mi, qey ti nêwena? Nano ki mi hedîrnayo ti tira hes nêkena?

Lîy va: -Başo, seredî mi ra cor o, mi qebûl kerd. Gerek şewna ti zî xêri ser o bêre keydê mi.

Qerteli va: -Hay hay. Çiman ser.

Lîy hînî darba xwi girot û ray kewt şî keye. Jî, haziriya xwi dî, helîra (herîla) xwi pîwt û wesêna qerteli dim, jê dawet kerd.

Qertel ame, liya to helîra xwi taht ser o rokerdi û qerteli ra va:

-De kerem bike.

Têreyd ronişî nanî ser û qertel ewniyâ ki helîr tena ya.

Lîy ziwanê xwi bin o kena wena feqet qertel tahta dûz ser o pê nikûl nişto boro. Ey se ko, hînî ameyo, dawetkerde yo.

Nikûla xwi di-hîrê ray da piro, tahta dûz û wişk a. Ewniya nikûl zî enka şona. Lîy zî ziwano sîr veto, eno pol dana piro û ay pol dana piro. De werê liy o. Helîr taht ser a pak kerd.

Ey eno dirum qerteli rê weşnêame. qertel agêra liy ra va:

-Bawer bike waya mi, ma ko tê ra biaqîti.

Lîy va: -Senî ma ko tê ra biaqîti? Ti ku ra şonê?

Qerteli va: -Ez firrena şona şayme.

Lîy va: -Keko, biray mi, ma biray yewbinan ê; tikê mi zî ber şayme, ez zî asmânan veyna, cayan û memleketan veyna. Tikê mi zî xwi reydi biçarni.

Qerteli va: -Ti mi reydi bigeyra, badîna ti ko poşman bîba.

Lîy va: -Qey ez poşman bîba? May way û biray yewbinan ê. Ez perrandê to weyşena û linganê xwi bindê qırıkta to di girêdana, ti bifir, mi cayandê neweyan ra biçarni mi binawni.

Qerteli xwi pîze di va "Ez firrena heyf tira nêgîra, sewbîna ez

nişta ja. Ay deka ki ja kerda mi!" Lîy wenişt bide û qertel erd ra berz bî. Epeyi berz bî, tadya liy ra va:

-Way mi, cay çî to ra aseno? Lîy va: -Hema hinda yew ci-wêni dinya mi ra asena.

Qertel ver bi cor hîna berz bi, rayna persa va:

-Hema zî çî aseno? Lîy va: -Hinda yew pirjin din-ya mi ra asena.

Qertel tikêna şî qayme û rayna persa va:

-Hema zî çî aseno? Lîy va: -Çîyekî mi ra nêaseno. Dinya yewray tarî biya.

Qertel ray perrê xwi ena kişt taday, ray ay kişt taday, liy va:

-Keko ez kewta, keko ez kew-ta!

De qertel o, de rê zor bide ameya; hezê teyara xwi tada û liy to kişt ser qelibnay. Cor di amê war. Ge serî ser yena war ge qî ser yena. De asmên ra veradiyaya.

Vanê yew mîrdimo pîr zî citêr o, gay jê betiliyay û xwi rê tikê ronişto ki cîfê xwi verado. Yew kurka jê zî esta, rakerda ser o nimaj-mimajê xwi kerdo û ser o ronişto. Qey liy zî cor di ay hêgây ser o nîna war! Mîrdekk xwi ra cor ewniyêno, heze ki yew çî cor di bêro war. Mîrdekkê to wardeno xirpo remeno. Lîy zî bi emir bê Hûmay yena kurkda jê ser ro gun-yena. Ey çi nêbena. Tîkê noq-moqê ja dejenê û hêdîka wardena, kurka mîrdekkî pira gêna, yella sona.

Zaf-tay, geleki ca şî, pê qur-reyê kerd û hind ewniyay ki yew verg ja ver o vejîya, tira va:

-Waklî, ena çî kurk a?

Lîy va: -Lo qey ti nêzanê?

Vergî va: -Ez nêzana. Eger esfi, yew enawayen bidi mi zî.

Lîy va: -İhê! Ena hema kihêna ma ya, mi vista polandê xwi ser. Ez to rê yew kurk viraza ki ti tira bewnî delu (delf) bîbê.

Vergî va: -Tî çi zana kurkan viraza?

Lîy va: -Liya, ez kurkçî, pî mi kurkçî, maya mi kurkçî, eb û ejdâdê ma pêro kurkçî. Ez zî kurkçî birinci. To rê yew kurk viraza ki zimistanî ti pê vewr ser o rakewî zî qet xem nêkenê.

Vergî va: -Wilahî eger enawa bibo, temam o. La heqê to se beno?

Lîy va: -Ez heq to ra nêgêna keko, feqet roj di gerek ti yew mîşna biyarê. Çimkî kurk pûrtê mîşnan ra viraziyêna.

Vergî va: -Serî ser, çiman ser.

Xwi ra kar û gurey vergî zî diz-dêya mîşnan a. Lîy tira va:

-De ma şorê mi rê yew qulik zî virazê.

Wir di piya şî bindê yew zinarî di yeş qulik viraşt ki liy tena bi zor şena tiro şoro û bêro. Ú vanê liy şî dekewt mîyandê qulik, tadiyay vergî ra va:

**Kitabêdo newewo
erjiyaye vejiya!**

Adresa waştişî:

Zossener Str. 41
109 61 Berlin/Deutschland

FERHENGEKÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ-V

Malmisanij

Kirdkî (Zazakî)

dare, dari
darû, derman
daye
dayene, dayış
dax
-der, -dir, tede, tadir, tey
derg
dergî, dergey
di, didi
dime
dindan, didan, didon
dipa, dipayin (însan)
dis, dus, cus
ditene, dutış
diwês, diwis, duyes, des û didi
diyaye, asaye
doş-î
dumbilik

E
-e (kevte)
eba, ebe, ebi, eve, bi, be
eferim
ejdeha, ejdiha
-ek, -ik (lacek/layik)
eke, eki, ke, ki, eger
em- (emserr, emşo), im (imsarr)
'embar, 'imbar
embaz, hembaz, imbaz, erbaz, olvoz
enbazi, embazey, hembazi, embazi
endi, hende, honde, hendi
endikek, indikek, hondike
engemîn, ingimîn, hingimîn
engiştî, ingiştî, bêçike
enguri, hengûre, inguri
eno/ena, ino/ina, no/na
enusk
ereq, areq, araq
erey, herêy, berey
erjaye, ercaye
erjaye, ercaye
erjaye biyayış
erjayeyî, ercayey, giranî
erci
eskize, eskici, eskiji.
espar, suwar, siwar
espice, espiji, espiji, aspize.
estare, astare, istare

Pehlewki (1)

dar, daru
darûk, darû, derman
datek
daten
dax
ender, der
diraz, draj, derg, degr, dêr, dêreng, direng
dêrengîh, direngîh
do
dumbek
dendant
dopad, dopay
dês
dûşiten, doxten, dûxtan (2)
devazdeh, dvazdeh
dîter
doş (3)
dumbelek

E
-î (ketî)
bi
eferim, aferin
ejdeha, ejdiya; zîya
-ik (lawik)
heke, ku, eger
î- (isal, işev)
'embar, 'enbar
heval, hevkar
hevalî, hevkarı
ewqas, ewende
hindik
hingiv, hengiv, hunguv
bêçî, pêçî, tilî
tîrî
ev
neşuşî, qirêj
weh, xwî, xu, xuh
dereng
hêja
hêja bûn
hêjât
hêja, hêjât
mewij, mewuj
siwar, suwar
spî
stêr, stêrk

Kurmanckî

dar
derman, darû
dayî (yê/ya ku hatiye dayîn)
dayîn, dan
dax
(di nav de), têde
dirêj, dirêjî
dirêjî
du, dudu
dûv, dûvik
didan, diran
dupê
mîna, wekî
dotin, duwîtin, dwîtin, doşîn
duwazdeh, diwazdeh, donzdeh
diyar, yê/ya ku xuya dike
pîl, girmilk
dimbelek, dimbilk, dinbilk

(1) Kelfimêyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjnay: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî
(2) Hûmara 156. A Armanci di herinda kelfimêyê Pehlewki "dûşiten, doxten, dûxtan" di, ebi şasey "pîl, girmilk" nusiyabi.
(3) Hûmara 156. A Armanci di herinda "doş" a Pehlewki di, ebi şasey "pîl, girmilk" nusiyabi.

-Gerek ti mi rê roj di yew mîşna biyarê fektê berî di ronê û agêre sorê.

Verg şono dano piro roj di hercay ra yew mîşna ano û qulik ver di roneno, şono.

Cay mîşney nêverday. Des, ponçês, vîst rojî vîrafî; rojî va:

-Lila waklî, to kurka mi se kerd?

Lîy zere ra ciwab da va:

-Kurka to nême biya, sebir biki ko biqedîyo.

Verg teber a yo. De vergî ra çî nêaseno. Halbukê ci kurk a, ci şî

yo! Liy... wer nana, goşte mîşnan wena û cir-cîra ja ya, rêx finena; kamî rê lazim a kurk!

Cendeyna vîrat, verg hînî ewniyâ ki peynîya mîşnan û kurk nîna, agêra liy ra va:

-Herê herê! Hinî mi fam kerdî ki to ez xapênya, ey ez se ka, nişta xwi to resna. To dayikta mi nayo. Ez enî berî ver a tê nêgêrena heta ki ti vejya.

Vergî se kerd? Vanê verg şî yew kuya cilan peyda kerd, da-des hebî xîncî dekerdi û kuy serberdê qulikta liy ra leqnay, da piro şî.

Çiqas va ame kuy leqay, req-req kerd û liy xwi pîze di va "wila verg didanânê xwi seqênenî". Xwi het va "hero wila ti nişte mi rese".

Verg şî, tira dim yew aşm beyntar di vîrat.

Çiqas va yeno, ay kuy req-req kena û liy zî nêwtana zere ra vejyo teber, vana qey verg ja paweno.

Vanê rojî va: -Liya peynîya enî didanandê xalî! Qey mîrat we zî veyşan niyo? Eno vîst rojî yo ki

berî ver di paweno. La wila ez ko vejya, yan ko mi boro yan zî ez bixelisyâ.

Lîy to xwi hedîrna û heze va xwi fektê qul ra vist teber. Wexto ki liy pêt xwi virr kerd şî ay daş,

xwi ra dim ewniyay ki ci verg o ci çi yo! Ewniyay ki berdê qul ver di yew kuy leqena û tay xîncî miyan d' ê. Va çiqas dano piro, kuy leqena û req-req kena. Lîy xwi rê xwi rê va "Ha hew! Mi werda ena kuy nawo! Mi verê bizanaynê kuy a, mi ja gitrotê boçta xwi ra bestê".

Lîy cayîlê kerd, raşa kuy girot boçta xwi ra best û da piro şî.

Zaf-tay, epeyi ca şî, raşa yew çemî amê û piro gunyay ki vîro dopol, qey fekê mîrata kuy qul bî, aw debî, pirr bî. Aw ki debî pirr bî, kuy giran bî. Lîy nêmedê çemî resaybî. Xwi ant û aw kuy kaşkerd. Bi hukimdê aw û giranêda kuy ver, boçta liy kok di qerifiyay, bî liya boçqol.

J. Espan
Tanî Estanikî
û Deyirê Ma
Weşanên Rewşen-28

Birîn kûr e derman...

Ji aliye din beriya demekê YNK'ê, PDK bi peqandina pirekê tawanbar dikir û nuha PDK YNK'ê bi teqandina tirimbêla ku li Zaxoyê hate teqandin û di encam de 76 kes mirin û pirtir ji 150 kesi jî birindar bûn, tawanbar dike. Heger ev iddia rast bin diyar dibe ku herdu aî li hemberî hev hin metodê şerî yên nû ku tu carî di jiyana xwe ya tekoşinê de li hemberî dijmin bi kar neanîne li hemberî hev bi kar tînin. Bala xwe bidin! Ev teqandin ne li dilê Kurdistanê Kerkükê û ne jî li Mûsilê ku di bin kontrola Seddam de ne, nayêne kirin, li herêmê ku di bin desthilatdiya kurdan bi xwe de ne têni kirin. Di vê rewşa aloz de dijminen gelê Kurd bi hêsanî dikarin karen xerab bikin û rewşa hîn jî aloztir bikin.

Rewşike seyr e.

Heger ev dijayedî weha dom bike ne dûr e YNK rengê zer û

PDK jî rengê kesk ji alaya Kurdistanê derbixin! Ma ne Tirkan ji ber dijayedî rengan lampeya kesk ya hatuçûnê bi rengê şîn re guherandin.

Di warê mafê mirovan de herdu ali jî riayetî mafê mirovan nakin û ev yek jî bû sebeb ku Amnesty (Rêexistina Navnetewî ya Efûyê) di derheqê wan de raporek bêtîn 120 rûpeli biweisine. Ka demokrasiya kurdan a ku me bi serbilindi behsa wê dikir? Ma ne şerm e Kurd jî di raporen Amnestiyê de li tenîti Seddam ciyê xwe bigrin?

Kurd û Seddam di warê ambagoyê de ji hev re kompromîsê dikin lê li dijî hev vê yekê bi tûndi bi kar tînin. Gelo ciama em Kurd hewqasî li dijî hev in lê dema tê xelkê bi işaretek wan em xwe davêjin himbêza wan? Ev halê me dê heta kengî weha be?

Ev rewşa iro rê li ber hatina Seddamî xweş dike û gelê me gêrî himbêza celladan dike. Di roja iro

de ku Seddam êrişek bîne ser Kurdistanê ez ne bawer im ku dînayê weke berê dengê xwe li dij bilind bike. Jixwe li gor hin zanyariyên ku ji herêmê têni hêzén Seddamî hin never dane ber topan û ser di navbera YNK û ordiya Seddamî de derketiye. Em Kurd li ber çavê dînayê wer diyar bûn ku em nikarin xwe bi xwe idare bikin û nikarin bibin alîkar da ku li herêmê istiqrar pêk bê. Di vê rewşê de xelkê ciama alîkariya me bike?

Partî û serok divê bi qencî û xizmeta xwe navê xwe li dîroka neteweyê xwe de binivîsin ne ku bi neqencî û xirabiyên xwe.

Wext hîn jî ne pir dereng e. Meriv ji ku dera zirarê bi şûnde vegere kar e. Çare heye, ev jî bicikirina demokrasiye ye, di rewşike demokratik de tehamulkirina hev e, dev jê berdانا partî û ezîfiye ye, parastina berjwendiyê gel berî her tiştî ye.

Bes e edî, guneh e. Gelê me ne layiqî vê yekê ye.

N. Eli

Zaxo di bin postalên...

Li gor iddiaya dewleta Tirkîye 6 kampê PKK'ê li Kurdistanâ Iraçê li herêmê Sîneht, Metîna, Mezî, Xakurk, Heftenîn, Bote û Şîviyê hene û di van kampan de nêzi 3000 hezar gerilla perwerde dibîn û Tirk dibêjin heta em vê pirsê ji binî safi nekin emê leşkerên xwe ji vir venekşinîn. Lîne karê aqilaye ku ji bo 3 hezar gerilla, dewletek 35 hezar leşkerê xwe bişîne ser wan û wan berteref bike.

Ev rast e rast dagîkirina welatekî ye. Şerî xwekujiyê ku di navbera PDK û YNK'ê de heye rê dide ku Tirk bi hêsanî welatê wan dagîr bikin.

Li gor Wezîre Parastinê yê Tirkîye Mehmet Gulhan di vî şerî de 200 gerilayên PKK'ê û 8 leşkerên wan hatine kuştin. Lî ev iddia ji aliye ajansên cîhanê ve nayênerêkîn. Wexta rojnameya me ket çapê (22 Adarê) jî di derheqê kuştinan de faktên konkret negîhiştibûn me.

Berdevkê hukûmet û dewleta Tirkîye dibêjin ku ev operasyon pişti herekata Qibrîsê hereketa herî mezîn e. Hemû partiyen Tirkîye di vê operasyonê de piştgiriya hukûmeta xwe dikan. Serokkomar, serokwezîr û wezîrê derve yê Tirkîye ji bo vê operasyonê bi dewletên cîhanê re ketine diplomasîyeke mezin. Cîhan li hember vê oper-

asyonê bê deng e. Dewleten ku leşkerên xwe dane "Hêza Çakuc" û bi taybetî jî Amerika di vi warî de piştgiriya Tirkîye'de dike.

Herçiqas berdevkê hukûmet û dewleta Tirkîye dibêjin ev opersayona me ya leşkerî tene li dijî PKK'ê ye, lê hecim û mezinahiya operasyonê nîşan dide ku ew dê demeke dûr û dirêj li wir bîmîn. Ji xwe dewleta Tirkîye dibêje pişti Şerî Xelîcê li "Bakurê Iraçê" valahîya otoriteyekî heye û PKK'ê jî ji vê valahîye feyde wergirtiye û li wê bi cih bûye. Wer xuyaye heta li wir otoriteyeke li gor dilê dewleta Tirkîye cînebe dê ew li vir cih bîbin.

Weşanên Nuh

Şerko Bêkes

Küçük aynalar

Çarçra Yayınları

Naci Kutlay

49'LAR DOSYASI

Kurdisk Dansk

Gyldendals Små

Gabar Çiyan

Kronolojiya Salvegeen Kurda

Şerko Bêkes; Küçük aynalar (helbest) Weşanên Çarçira, İstembol, 1994, 68 r. Helbesten Ş.Bêkes cara yekem wek pirtûk li Tirkîye bi zimanê tirkî derketiye. Wergera helbestan rasterast ji kurmanciya xwarê ji aliye Azad Şatehî û Abdullah Babekir Pişderî hatiye kirin.

Naci Kutlay; 49'lar Dosyası (lêkolîn) Weşanxaneya Fîrat, İstembol, 1994, 260 r. Nivîskar di vê pirtûka xwe de xwestiye bûyera 49'an bi belgeyan raxe ber xwendevanan. Di dawiya pirtûkê de hin resim û kûpêrên rojnameyên wê demê hene.

Kurdisk Dansk ordbok (ferhenga Kurdi Danîmarkî) Weşanên Gyldendalske Boğhandel, Copenhagen, 1994, 335 r. Ev ferheng ji aliye Mesüt Zilan ve hatiye amadekirin û ji 22000 bêjeyan bêkhatiye.



Gabar Çiyan; Salvegeren Kurda (kronoloji) Stockholm, 1994, 45 r. Nivîskar bûyêrên girîng yê kurdan di vê broşorê de civandiye.

Çexov; Bexçeyê Vişne (şano) Weşanên Nûdem, Stockholm, 1995, 92 r. Ev berhemâ Çexov ji aliye Firat Cewerî ji swêdî û tirkî hatiye wergerandin. Piyes ji çar perdeyan pêk hatiye.

Nüreddin Zaza; Bir Kurt olarak yaşamam (bîranîn) Weşanên Mezopotamya Publishing, Stockholm 1994, 361 r. Ev pirtûka N. Zaza ji aliye Aytekin Karaçoban ji orijinala frensî hatiye wergerandin. Pêşgotina vê wergera tirkî ji aliye Omer Şêxmüs hatiye nişvin.

Egîdê Xudo; Dê û Dêmarî (roman) Weşanên Nûdem, Stockholm, 1995, 112 r. Naci Kutlay ev roman ji tipen Kirîlî kiriye latînî. Pirtûk cara ewil di 1986'an de li Yêrevanê çap bûye.

Zenelabidîn Zinar; (listikên zarokan) Weşanxaneya Pençînar, Stockholm, 1994, 120 r. Ev pirtûk ji du besan pêk hatiye. Di besa yekem de 32 listikên zarokan hene, besa duwem de ji 15 listikên mezinan cî digrin



deku Seddam êrişek bîne ser Kurdistanê ez ne bawer im ku dînayê weke berê dengê xwe li dij bilind bike. Jixwe li gor hin zanyariyên ku ji herêmê têni hêzén Seddamî hin never dane ber topan û ser di navbera YNK û ordiya Seddamî de derketiye. Em Kurd li ber çavê dînayê wer diyar bûn ku em nikarin xwe bi xwe idare bikin û nikarin bibin alîkar da ku li herêmê istiqrar pêk bê. Di vê rewşê de xelkê ciama alîkariya me bike?

Pêla êrişan ranewestiya, Ozgur Ulke bi bahane ya berde-wama Ozgur Gundem'ê ye girtin. Medya Guneşî ji bo nivisekê bi bîryara DGM ya İstanbulê mehekî dan rawestandin. Ü bi sedemeka wek ya Ozgur Ulkeyê Dengê Azadî jî girtin. Realîte her çiqas zimanekî cûda û nerm bi kar tîne jî ji êrişen dewletê para xwe girt. Berpirsê Realîte Orhan Kotan di programma radyoya Swêdî de got ku "ewê rojnameya xwe bîdin sekinandin".

Di van demen dawî de dewletê bi taybetî rika xwe li Medya Guneşî girêdaye; Roja 28'ê Si-

Êrişen dewletê...

batê dewletê girt ser buroya Diyarbekir, xebatkar û xwendevanê wê girtin, işkence kirin; 6'ê Adarê dîsa dewletê girt ser buroya Diyarbekir û di wê rojê de muxabîrê wê Ş. Kararkurt li sükê girtin, 30 seeti pê işkence kirin; Roja 8'ê Adarê dîsa îcar bi şev ketin buroya Diyarbekir. Di navbera 1'ê Sibatê û 9'ê Adarê de dewletê 4 caran girt ser buroya Edenê.

Diyar e dewlet êriş û terora xwe wê li ser çapemeniya Kurd hîn bidomîne. Çapemeniya Kurd jî di gel hemû dijwarî û asten-giyan li hember êrişen dewletê jî singa xwe dike çeper û karên xwe yên pîroz didomîne.

QERTEL Ü...

Lîya Boçqol sî embazandê xwi miyan, ay va "Lîya Boçqol", ay va "Lîya Boçqol". Ku ra ki sî va "Lîya Boçqol", peynî eno name ja ser o mend.

De liya feniker a, bindê qalda yewî di manena? Rojî xwi rê dişmîşbî, xwi sere di va "ez senî bîka ki namê boçqolê xwi ser ra wederâ?" Yew pilan vîraşt û agêray embazandê xwi ra va:

"Eylekînê! Jîma zanê mi yew rez ca kerdo, xêr û xêrat o. Engûra jê zaf a û herkes xwi rê şono weno. Heta enka şima pê nêhesiyay?

Embazanê ja va: -Nê, ma pê nêhesiyay. Eno rez ku ra d' o? Ma rê zî vaj.

Lîya Boçqol va nanîk o filan ca d' o.

Embazanê ja va: -Ma key şorê?

Lîya Boçqol va: -Meyşt rojî ki silam da ma şorê.

Bî rojô bîn, serê sibay pêro kirêşay rezî miyan. Lîya Boçqol agê-ray jen a ra va:

-Şima zanê, enawa nêbeno. Ez şima rê yew qal vaja: Yew üsilê werdi esto.

Embazanê ja va: -Çî yo eno rayîr û üsilê werdi?

Lîya Boçqol va: -Wayîrê rezî vato "wa yewî mîwda yewî ra nêboro, wa herkes mîwda xwi ra boro". Eno semed ra hewciya yo ki ma herkesi mîwda jê ra girê dê. Nefs o, yan zî mîwa jê qedyena şono mîwda bini.

Lîya to ya boçqoli ardî boçê liyandê binan pêro mîwan ra girêday uva:

"Şima çiqas şenê de borêne! Texsîr mekê, darb darba şima ya, roj rojê şima yo.

Vanê enî liyanê bîna gore ba nêm se'etî engûr werd û Lîya Boçqol vejîyay lewî ser, qestî ra veyn da va:


"Eylekînê! Ame ha! Wayîrê rezî ame! Vazdînê, wayîrê rezî ame!

Wexto ki Lîya Boçqol enawa va, heryew lîy xwi cay ant, boçê jen pîrin qerîfiyay.

En ki amê pêser, Lîya Boçqol agêray jen a va:

"Herînê! Jîma mi ra vanê "boçqol", enawa beno şima ha!

Bi eno hawa Lîya Boçqol embazê xwi pêro kerdi sey xwi û ez ameya, ên xwi rê geyraynê.



Kovara Komeleya Nivîskarê Kurd li Swêdê, CIRA derket

Nivîsên vê hejmarê

M. Malmîsanij- Min Şêx Se'îd dît

Naci Kutlay- Şêxo

Kerîmî Husami- 50 Saley Seyful'l-Quzat

Kemal Burkay- Helbest

Rohat Alakom-Sefera Yaşar Kemal

Rojen Barnas -Heci Mihemed Qelşo

Zinar Soran- Civata Azadiya Kurd

Nedim Dagdeviren- Îboyê Dînamât

Mayakovski- Ez bi xwe (Werger: Musfata Aydagân)

Ahmet Cantekin- Ya da Ez

J. Espar- Helbest

Osman Aytar- GAP û Mîrata Kulturî

Paşa Uzun- Ji Sifirê

Munzur Çem- No Kî Ma Ra Wo

Haydar Diljen- Dimilkî di Nêri û Makî

Se'îd Kawe- Bira ro

Rastiya Civata Kurd

■ Bilal Görgü

Ji meha Gulana 94'an vir de rojname û kovarêne me Kurdan li ser rewşa aloz ya nuha li Kurdistanê Başûr rû daye, disekinin û awîrên xwe diyar dikan. Awirê hemûyan kêm û zêde wekî hev in û gelekî hîssî ne. Rast e, serxwebûn û şabûna Kurden Kurdistanê Başûr serbilindi û şabûna me hemû Kurden e. Dîsa şerê wan ê navxwe û xemgîniya malwîraniya wan jî a me hemû Kurden e.

Ev ne cara yekem e ku Kurd li Kurdistanê serbilindiya serxwebûnê dijîn. Kurdan ji bona serxwebûna Kurdistanê di van sedsalêna dawî de gelekî şer kirine. Di şerê xwe de pir caran nêzî serxwebûnê bûne û hînek caran jî serxwebûna peryodê kin jiyan. Mixabin şerê serxwebûna Kurdistanê ci nêzî serxwebûnê, ci peryodê kin jiyan hemû ji aliye dijmin ve bi xwînî hatine fetisandin. Fetisandina serîhîdanê Kurdistan bê şik û guman xurtbûna dijmin ve têngîrîdânê; dijmin xurt e, bi hêz e, em ci bikin?.. Û bi şerîtên siyaseta dînyayê re naguncin. Em li vir nikarin fetisanâna serîhîdanê serxwebûna Kurden te-nê xurtbûna dijmin û şerîtên siyasi û dinê ve girêbidin. Llê hînek foktorê din hene, elementen gelekî kevnin, gora civata rojane nînin, di civata Kurd heyânuha xwe parastine û tesîrek gelek bi hêz û fireh li ser jiyanâ civakî dikan.

Civata Kurdistanê wek tabloyekê mozaik renga reng e. Bi sedan milet dûr û nêzîk hatine Kurdistanê hîwîrin e, hin li wan bûne mîvan û cînarê Kurdistan, hîna ji wan şerê Kurda kirine. Gelek caran li sînorê Kurdistanê, hin caran jî li ser axa Kurdistanê dewlet û imparatoriye mezin ava kirine. Ew dewlet û imparatoriye hanê rûxiyane, aj û kokêwan wenda bûne. Ew hatine çûne, lê Kurd li Kurdistanê li ser deşt û baniyan, gaz û çiyayê xwe mane û berne dane, jiyanâ xwe çê an xirab heta nuha domandine. Vê hatin û çûndinê di civata Kurdistanê de gelek guhertin pêkanîne û ji ali-yejkî jî bûne manîdarê guhertinê nuh. Ci di şerê navbera miletê din û Kurdan de, ci jî di şerîn navbera dewletê xerîb û mezin li ser axa Kurdistanê bûne, gund û bajaren Kurdistan xan û xerabe kirine, mal û milkêwan talan kirine, zengîniya Kurdistanê bi xwe re birine. Ev bûyer bûne sedenm ku dêvîla civata Kurda pêş de here, xwe nuh bike struktura xwe bi-guherîne paşa maye û strukturê xwe û kevin tim parastîye, bi xwe ra heyâroja iro aniye. Yek ji wan elementen kevin ku civata Kurdistanê de gelekî ciwan dijî, struktura eşîriye ye. Eşîru û qebileti, elementen civatêne gelekî kevin û paşdemayîne, li ser hîmî xisim û eqrabatiye û girêdana xwînî ava dibin. Dijminatiya xwînîrjandinê di navbera wan de heye û menfeetêne eşîru û qebileti menfeet û xwes-tinê milet yê tevayî tê. Pir zû manîpule dibin û gelekî zû ji alî diquherîn. Eşîru û qebileti di nav sinorê xwe yê teng de dijîn û pîrî caran xwe ji eşîru û qebileti.

Kurdan yê din dûr dibînin, Nakokî û gelşen xwe bi destêne se-rokeşîren xwe çareser dikan. Ji ber vê yekê li Kurdistanê yekîtiya Kurdan çenebûye. Eşîru û qabile-yen Kurdan di mintiqêne xwe de bi armancen serxwebûna Kurdistanê rabûne û dîsa tenê mane û bi ser neketine. Wan menfaetêne xwe yê eşîrtî danine pêsiya menfaetêne Kurdan. Wan pişta xwe nedane hev, bîlekiti yekî li dij yê din şer kirine. Ji bo vê ye ku serîhîdanîne Kurdan karektereke hê-rêmî(lokâl)stendinê û bi vî hawî dijmin bi hêsanî ew fetisandine. Lî gelek caran jî hewcedariya dijmin nebûye ew bi xwe ketine qirka hev û oçaxê hev kor kirine.

Olperestiya Kurdan wek struktura eşîru û qabileyên wê gelek renge reng e. Piraniya xelkê Kurd misilman in. Lî Fille, Yahûdi û Ezidîyen me jî hene. Misilmantiya Kurdan jî ne homojen e. Gelek mezheb û terîqetêne cûda hene. Ji wan Sûnnî û Elewîti jî hev dûr in. Dîtinêne wan yêli ser îbadetê, adet û torênen wan, jiyanâ wan a malê û mezinkirina zaro-kan de gelek ji hev cuda ne. Ev cudas-bûyîna wan ras-tiyeke ber bi çav e. Zanebûna di derbarê van mezheb û terîqetêne nav milet de gelek kêm e. Piraniya Sûn-niyan li ser Elewîyan gelek tiştan nizanîn, zanîna wan teng û hukmî pêşin e. Nezanî sedemê nakokîye ye û hevûdu piçûk dîtîniye ye. Ev nezanî bûye sedem ku ew ji hev dûr bi kevin. Pir caran jî dijmin ev cudabûn bi kar anîne û ew bera hev dane.

Mozaika Kurdan a li Kurdistanê tenê bi van cûdayîyan jî namîne. Ji ber sebebîn siyasi û aborî, cudabûna struktûra eşîrtî û qabiletiye, cudabûna mezheb û terîqetan mixabin di nav hevwelatiye me de bûne sedem ku zimanekî taybeti ku ji aliye hemû Kurden Kurdistanê ve bê fehmkirin peyda nebûye. Nuha li Kurdistanê ci ziman, ci devok û ci jî lehçeyen ne wek hev li pêsiya Kurdan asten-gekî mezin e ku ew ji hev fehm nekin. Ev realiteya Kurdistanê ye.

Meriv wexta bala xwe dide vê tabloye meriv astengîyen pêsiya tevgera rizgariya Kurdistanê dibîne. Ev cudayeti bûne sedem ku Kurden nehatine ba hev, ew ji aliye dijmin ve hatine xapandin û li hember hev hatine bi kar anîn. Vê rewşa aloz a Kurdistanâ Başûr em xemgîn kirine.

Ji bo vê yekê jî divê berî her tiştî cu-dayetiye civata Kurda bi zelalî û bi awayek tolerans bîn eş-kere kirin û di nav milet de bîn qebûlkirin. Kurda bi fêmkirina van cudayetiye civatê û nêzî hev bibin, dê nebin listikêne dijmin. Dê eşîru û qebile bi zaneti nêzî hev bibin û hev qebûl bikin. Lî Fille, Misilman û Ezidî dinê hev qebûl bikin.

Dîrok ji tekerûre ibaret e. Ger armaca me Kurdan azadî û serxwebûn be, divê em van cudayetiye civatê bi hev bidin qebûl kirin û ji civatê re zelal bikin. Lî divê em baş zanibin ku em milet in. Ü ev cudayeti dewlemendiya civata me ye jî.

BEROS



Mahmûd Lewendî

DU HELBESTÊN WEK BER-LEHÎ*

Min di hejmara berê de piçekî qala helbestvanîya xwe kiribû. Îcar di nav vê hefta dawîn de bi qasî du barê kerên Bismilê name, pîrozbayî û gîlinameyên we yê hêja û buha û giran (nêzî çar kiloyî) xwe di qelîşteka deriyê me yê ku ji ber van xwedênehişten postecian, ne di tu halî de ye, gehîştin destêne me. Îcar li ber ronahiya wan, hewesa min a helbestnîvisandînê bêtir pêl da û berîya ku bibe lehî û min û mala min bide ber xwe, va ye ez wan helbestan bi ser we de dişnim. Înşallah bi dilê we be. Û Xwedê we ji wan bisitirfine!!!

*Ber-lehî: Ez nikarim dûr û dirêj qala maneya wê bikim da ku serê wê bêtir tevlihev bibe. Hema ferqa "endam" û "ber-endam" ê çi be, ya "lehî" û "ber-lehî" yê jî ew e.

Helbesteke dadaîstî

TING

| | |
|---------------|------------------|
| Ting û ting | Meqes û hevring |
| Ring û ring | Derpê û deling |
| Ü ting û ring | Qaz û queling |
| Ü ring û ting | Kanê tiving |
| | Ü ding û ding!!! |

Govenda li ber deholê

| | |
|----------------------------------|---------------|
| Deholvan | |
| Rakir qolqitê xwe | |
| Go gurîm, li deholê xist | |
| Gurmîn bi asîman ket | |
| Gupîn bi dilê min ket | |
| Ü bi zire zira zirnevan re | |
| Lerzan bi laşê min ket | |
| Nigê min ê 43 numre | |
| Di pêlavê 44 numre de tengijîn | |
| Ü beçîya min a girikê | |
| Bi guçkî gorê girt û serî kêşa | |
| Çar beçîyên din li dû xwe vekêşâ | |
| Ü di nav pêlava min a | xweyandayî de |
| Govendek girtin | |
| Govend geş bû | |
| Pêlav ji xweydanê reş bû | |
| Bêçîya girikê gêj û bêheş bû! | |

ÇEND GOTINÊN XWEŞIK Û GULOVER

-Apê min ê bi guh û çavekî, diajo garana wateletê.

-Bêdengî carna tirsekî ye, tirsekî jî parceyek ji mîraniye ye.

-Bihara bi gulekê were, hema bila neyê.

-Bijî evîna aza, bimre qelinî-békarek

-Bijî hebûnîzm, bimre rûfîzmlî-rûtek

-Billeheq nepên ez nayêmlî- erzanî

-Em li serokekî digerin! -taban

-Ez bi berçavkê ranekevîm, di xewnê de ez nikarim tu tiştekî bibînim.

-Ez rastî li keseke nehatim ku ji kêfa mîrîbe!

-Gelo li Swêdê kurdek heye ku ne nivîskar be?

-Ger qanûn û qaideyên rîvebirinê tunebin, wê wextê teşqe û şer dest pê dikin.

-Golikê malê ji gayê malê natirse, lê herdû jî ji xwedîyê malê ditirsin.

-Jin bela ye, zarok ji hella hella ye.

-Ji derveyî metodêne klasik ên xwekuştinê, li rîyeke din a xwekuştinê digerim. - serokek

-Jina ku ji bin emr û ferma mîrê xwe derkeve, ew ne bindest e.

-Kengî mîr jî zarokan binin, wê çaxê wek-heviya jin û mîran biparêzin.

-Kes şîretê naxwaze, herkes pere dixwaze, dêmax pere ji şîretê baştı e.

-Li tabanê xwe digerim!-serokek

-Ruhayî bi saya serê isotê ji AIDS'ê filitîne!

-Tahma xwarina herî xweş li gor hebûna dîrana ye.

-Wexta ku xewa min neyê, ez qahwê ve-dixwim.

-Xwarina bê xwê, ne şor e.

-Zebeş nîşanî serokekî Kurdistan dan, got: "Ev kundir e!" Nîşanî serokekî din i Kurdistan dan, got: "Na, pettêx e!"

WEK SABUNÊ

Ji feqirekî pirsin: Tu çawa yi?

Got: Wek sabûnê!

Çawa yanî?

Roj bi roj dimehim û dihelim!!!

ne karê aqila ye lê rast e

Amadekar: Hesen Mizgîn

Wek tê zanîn hin heywan dema zivistan tê dikevin xewa kûr, mar, hirç, şebşebek û jûjû ji wan hin mîsal in. Beq jî dikevin xewa kûr. Lî ketina xewa kûr a beqan naşibe ya mar, hirç û hwd. Dema beq dikeve xewa kûr hucreyên xwe diqerisîn. Berê ku bikevin xewa kûr glîkoz û glîserol hildiberîn û bi xwînî dişinîn hin ciyên taybeti yê laşê xwe. Glîkoz û glîserol ji bo balansa germiyê bi kar tîmin, der û dora organen xwe ji diqerisîn daku tu zerar neyê wan.

Teyare nikarin li ser atmosferê bifirin. Ji bo firîna wan hewa divê û li ser atmosferê hewa nîne.

Tirêjîn rojê 150 milyon kilometreyên di navbera rojê û dinê de di 8 deqîqeyan de distinîn.

Japonî bi roboteke nû dikarin noqî kûrahiya okyanusun bibin. Navê vê robota Japonî kaiko ye û wê di demek nêz de Kûrahiya Challenger'ê.

11033 m kûr e-ziyaret bike.

Li welatêna paşdemayı insan ji %20 ji ber nex-weiseña sorikê dimrin.

Li Amerikayê demançeyek ku ji dêlvâ gule, kefa zeliqandinê berdide hatiye çêkirin. Dema ev kefa zeliqandinê li yekî/a súcdar dikeve, bi xwe ve zêde dibe û kesê/a súcdar di çiyê xwe de dizelikine. Ev demançeyek hem ji ali banka û hem ji ji ali avahîyên din wek sentrala enerji ya aborî bi hêviyek erêni tê qebûlkirinê û daxwazî heye ku bi kar bînîn. Lî belê ji ber ku çare ji bo helandina ve kefa zeliqandinê nehatiye dîtin demançeyek hem ji ali aborî bi kar bînîn.

Parabol antena Universita Harwardê 8,4 milion kanalan guhdarî dike.

Astronomî Amerikî heye iro ji asûmanê 37 sînyalîn radyoyê yêne ji dinê ne yan ji naşibin sînyalîn an radyoyen dînyayê bi saya antenê xwe yê mezin li Harwardê Amerika Bakûr û li Buenos Aires'ê li Arjentînê, girtine.

Arkeologî Amerikî şopa keştiya Nûh Pêxember 27 km li başûra Çiyayê Agiri dîtine.

Di şeveke sayî de Stêrkêne ku li asûman tê dîtin ji %5 Stêrkêne li asîmanê ne, ji %95 nayen dîtin.

Di kutba bakûr de qalindiya qesâyê nêzî 3-4 metro ye û ji bo danîna teyareke giran tê dike.